Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1361 22-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Barê koçberiyê giran e’

Ayşa Silêman/Dêrik

**Koçberên ji Efrînê yên ku li Kampa Newroz bi cih bibûn diyar kirin ku ev cara çaremîne ku ji ber êrişan koçber dibin û wiha gotin: “Barê koçberiyê gelekî giran e, em her di wê baweriyê de ne ku em ê careke din vegerin li ser axa xwe ji ber ku me gelek êş dît di bin van çadiran de.”**

Gelê Efrînê di 18’ê Adara 2018’an de piştî berxwedaniyeke bê hempa neçar man ji cîh û warên xwe berdin û koçber bibin. Ji Efrîna rengîn ji axa pîroz berê xwe dan Şehba û li wir 7 salan jiyaneke zehmet dijiyan lê tevî wilo jî di dilê wan de hêviya vegerê hebû. Lê ev yek dilê dijmin hînik nekir bi êrîşên hovane berê xwe da Şehba û gelê Efrînê careke din barê koçberiyê hilgirtin û koçber bûn û berê xwe dan Tebqa û Reqa. Sedema êrişên dawî li ser gelê kurd, gelê Efrînê bi êşeke girantir ji şûna li warê xwe vegerin, careke din koçber bûn û berê xwe dan Hesekê, Qamişlo, Dêrik û gundewarên van bajaran. Niha jî sedema kêm derfetî rastî gelek êş û azaran tên, lê hêviya vegera Efrînê ji nû ve vejîn dibe, gelê Efrînê bi hestên gerim amadekariyên xwe dikin da ku vegera Efrînê bi çavên xwe bibînin.

Di derbarî vegera Efrînê û rewşa koçberan jinên koçber ên ji bajarê Efrînê Ewaş Xelîl û Zehra Bedir ji Rojnameya me re axivîn.



Ewaş Xelil



Zehra Bedir


**‘Barê koçberiyê gelekî girane’**

Koçbera ji Efrînê Ewaş Xelîl da zanîn ku ew di rewşeke zehmet re derbas dibin û wiha got: “Temenê min 55 sal e ev 3 rojin ez di nav cihan de me û ji ber zor û zehmetiyên jiyanê û derfetên kêm ez nikarim berê xwe bidin gel tu bijîşkî jî. Ev cara 4‘an ku em koçber dibin û barê koçberiyê gelekî girane, em her di wê baweriyê de ne ku em ê careke din vegerin li ser axa xwe ji ber ku me gelek êş dît di bin van çadiran de. Tevî ku Rêveberiya Xweser hertim destek jî dide me li jiyan di bin çadiran de nayê debar kirin. Ev nêzî hevteyekî ye baran nesekinye tevî serma zêde jî çadira me tejî av bûye ez û keça xwe nexweş ketin. Me amadekaiyên xwe kirine da ku em careke din vegerin ser mal û milkên xwe û bihna buharê li Efrînê bikin, em bi hêviyêne ku ev koçberî bidawî bibe û şervanên me vegerin gel malbatên xwe da ku gelê kurd jî bi rehetî bijîn li welatê xwe, tevî hemû êrişên ku li ser me pêk tên jî lê em xwedî îradene û em ê bi serbikevin jî.”

**‘Mirov li ser axa xwe şa dibe’**

Koçbera ji Efrînê Zehra Bedir anî ziman ku li tu welatan jiyan di bin cadiran de debar nebûye û wiha got: “Mirov li ser axa xwe şa dibe, lê gelê Efrînê ev 8 salin kêfxweşî nedîtine ji bajarekî ber bi bajarekî ve koçber dibin û roj bi roj barên girantir hildigrin. Destpêkê em ji Efrînê koçber bûn û me berê xwe da Şehba 7 salan ji Şehba em ber bi Qamişlo ve hatin here dawiuyê jî em neçar man berê xwe bidin bajarê Dêrikê û li kempa Newroz bi cih bibin. Ji ber barîna zêde ji baranê çadirên me di bin avê de man û hemû zarokên me nexweş ketin, her diçe jiyan zehmettir dibe. Yek hêviya me heya ew jî zûtirîn dem vegera li Efrînê ye, em ê li ber xwe bidin heya ku em vê hêviyê pêk bînin.”

**Bi kamîreya Amara Baran**



Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## Newroz Pîroz be!

Newroz û Bûhare û bi hatina wê re sal nûye û Adare. Ji bo Kurdan Adar û Newroz xwedî wateyeke pir mezin in ku di vê rojê de her cih û dera wan dixemile. Di Newrozê de Kurd êşên xwe dijmêrin û datînin aliyekî û jiyana xwe didomînin. Kurd tariya zivistanê û sermeya wê ji bîr nakin, lê bi germahiya Bûharê re Kirasekî nû li bejin û bala xwe dikin. Kurd vê Newroz û Bûharê pêşwazî dikin û di nava wê de şehîdên xwe, berdêlên ku hatine dayîn, bajar û gundên xwe, ax û dar û baxên xwe bi bîr tînin. Erê, Bûhar û Newroze, cejn û kêfxweşiye, lê ev Newroz ji yên beriya xwe cudatire. Qehremanên vê Newrozê yên Nû hene ku ew jî kesayetên wek Ziyad Heleb in. Şehîdên Kurdan û zarokên dayik û bavan in.

Newroza 2026’an, di nava hêrsa rizgarkirina ciwanên Kurd ên êsîr de agirê wê tê pêxistin û bi çirûska şoreşa li Rojhilatê Kurdistanê geş dibe.

Newroz li Kobanê tê pêşwazîkirin, lê Kobanî hîne di bin dorpêçê de ne û tirsa li ser vî bajarî hîne jî neqediyaye. Li Efrînê jî îsal agirê Newrozê tê pêxistin, lê hîne xelkê wê hemû venegeriyaye cih û warê xwe. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ne wekî her sal pêşwaziya vê Newrozê dikin û li Helebê hîne gelek kesên ku hatine revandin agahî ji wan nayê girtin. Li Dêrazorê û Reqqa jî bi dehan ciwanên Kurd ku li ber bêbextiya hin serok û êlên Ereb ketin, hîne bê agahî ne û êsîrin di destê van koman de. Li Bakurê Kurdistanê Newroza pêvajoya aştiyê ye, lê heta niha hîne statûya Rêber Apo di bin perdeyê de ye û bi hezaran çalakvan û siyasetmedar girtî ne. Selhedîn Demirtaş hîne di zîndanê de ye û birîna Sûra Amedê, Silopî û Cizîrê hîne vekiriye û qêrîna Mihemed  Tunc hîne di guhê me de ye. Hîne Kurd di nava malên xwe de li başûrê Kurdistanê ji ber şerê li herêmê û Mûşekên li nava Silêmanî û Hewlêrê dikevin, di nava tirsê de ne.

Birîn û êşa Kurdan wiha zêde û giran in, lê ev Newroz bi hestên Rojhilat û başûrê Kurdistanê ji bo Rojavayê Kurdistanê jî geş in. Me dît ku çawa dema êriş li ser Rojava pêk hatin, başûr tev de herikîn ku vê hemû Kurd li dunyayê hestiyar kirin. Ev Newroz, bi geşbûna çalakiyên Kurdan li Ewrûpa ji bo Rojavayê Kurdistanê gur dibe. Lewma, mirov dikare bibêje ku Kurdan êşên zêde heta hatina Newrozê kişandin, lê di nava van êşan de yekîtî, hevgirtin û rizgarî jî hembêz kirin û hîs kirin. Ji ber wê, Newroza îsal wê gelek kaniyên nû bi xwe re biteqîne da Kurd ji ava rizgariyê têr avê vexun.  Newroza 2026 li Kurdên Rojava û Rojhilat, Başûr û Bakur û Ewropayê pîroz be.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Lêva xwe bostekê dirêj kiriye:**
- Xeyidiye; eniriye.
**Lêva xwe kir:**
- Xeyidî; enirî; keyfa wî şkest.
**Lêva xwe daleqand:**
- Bi heman wateyê.
Lêporê xwe bi xwe ve berdaye:
- Pir xeyidiye.
**Ma hina nan xwariye te qet:**
- Ti kesî neheqî li te nekiriye; ji bo çi tu xwe dixeyidînî?
**Ma me jê re gotiye hespê te ker e:**
- Ma me xirabî pê kiriye heta ku xwe ji me bixeyidîne?
**Mirûzê xwe kiriye:**
- Pir xeyidiye.
**Nanê wî birî:**
- Êdî nehewand; jê xeyidî.
**Navbera wan sar bûye/ ji hev sar bûne:**
- Hevaltiya wan xirab bûye; weke berê ji hev hes nakin.
**Para xeydokan çû li ber bablîsokan:**
- Ji bo kesê dixeyide û zererê dibîne tê gotin.
**Pişta xwe didiyê:**
- Jê hes nake; jê xeyidiye; têkiliyên zayendî pê re danayne.
**Pişta xwe dayê:**
- Xeyidî.
**Pozê xwe kir:**
- Xwe xeyidand; nexwest biaxive.
**Pozê xwe jê ba da:**
- Bi heman wateyê.
**Pozê xwe hilanî:**
- Bi heman wateyê.
**Pozê xwe wir ve kir:**
- Xiyidî; ne bi dilê wî bû.
Qutbirî ye:
- Ji xeyda xwe venagere.
**Rûyê wî qermiçî:**
- Dema tiştek ne bi dilê yekî be, yan dema yek dixeyide, yan hêrs dibe, yan ditirse, yan diqehire, hingê tê gotin.
**Rûyê xwe tirş kir:**
- Xeyidî; tişta hatî gotin (yan kirin) ne bi dilê wî bû.
**Rûyê xwe tehl û tirş kir:**
- Bi heman wateyê.
**Rûyê xwe jê zîvirand:**
- Nexwest pê re bixaxive; jê xeyidiye.
**Rûyê xwe jê ba da:**
- Bi heman wateyê.
**Rûyê xwe jê guhert:**
- Bi heman wateyê.
**Tu dibêjî qey hina nanek xwariye wî qetek:**
- Xwe xeyidandiye.
**Tu li mala xwe ez li mala xwe:**
- Emê derê vê mijarê bigirin; emê têkiliyên xwe ji hev bibirin.
**Tu li ser riya xwe ez li ser riya xwe:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## Li cîhan û Rojhilata Navîn rola jin di aboriyê de û Jineolojî çawa dinirxîne?

Beşdarbûna jinan di warê aborî de, bûye nîşaneyek girîng a pêşketin û geşedana civakan. Bi berfirehbûna derfetên perwerde û kar, jin di gelek sektorên aborî de, ji çandinî û pîşesaziyê bigire heya bazirganî û karsaziyê, wekî hêzek çalak derketine holê... R-2

## DAIŞ berî 7 salan têkçû, lê destên reş ew vejîn kirin



Di 23'ê Adara 2019'an de DAIŞ weke rêxistineke leşkerî ya terorê li ser destê QSD'ê têkçû. Piştî 7 salan ji têkbirina wê, di dema heyî de dîse bi destên tarî û qirêj tê vejînkirin da ku bibe gefeke mezin li ser herêm û cîhanê.R-6



**NEWROZ, ROJA JINÛVE VEJÎN Û AZADIYÊ YE**
Bêrîtan Xalid R-2



**Cudahiya NEWROZA 2026’an**
Ahmet Aktaş R-6

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1361 22-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# NEWROZ HEBÛN Û NASNAME YE NE TENÊ BIRYAR E

Cejna Newrozê semboleke kûr a azadî, nasname û çanda Kurdî ye. Her sal di 21'ê Adarê de tê pîrozkirin ku bi hatina buharê û nûbûna xwezayê re hevdem e. Sekretêrê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanî – Sûriyê Ciwan Siko diyar kir ev cara yekem di dîroka Sûriyê de Cejna Newrozê piştî ewqase sal ku di bin navê “Roja Dayikan” de hatibû veşartin, bi fermî tê naskirin. Lê nabe cejin û mafên Kurdan bi rêya biryarên demkî sînordar bibin, divê ev maf di destûrê de bên bicihkirin ku mafên neteweyî, siyasî û civakî yên gelê me bên garantîkirin.R-4



# Li cîhan û Rojhilata Navîn rola jin di aboriyê de û Jineolojî çawa dinirxîne?

Beşdarbûna jinan di warê aborî de, bûye nîşaneyek girîng a pêşketin û geşedana civakan. Bi berfirehbûna derfetên perwerde û kar, jin di gelek sektorên aborî de, ji çandinî û pîşesaziyê bigire heya bazirganî û karsaziyê, wekî hêzek çalak derketine holê. Li gelek welatên cîhanê, hîn jî jin bi pirsgirêkan re rûbirû dimîne ku nikare bighêne mafê xwe yê aborî.

**Esma Miştefa**

### Hebûna jinan di bazara kar de

Di dehsalên dawî de, beşdariya jinan di bazara kar de bi girîngî zêde bûye. Ew ketine qadên ku berê ji hêla mêran ve dihatin serdestkirin, wekî rêveberî, aborî û teknolojiyê. Herwiha wan di sektorên perwerde, tenduristî û xizmetguzariyê de roleke girîng lîstine û beşdariyeke eşkere li aboriya neteweyî ya gelek welatan kirine. Nimûneyên serkeftî yên jinan ku karsazî û şîrketên xwe ava dikin jî derketine holê ku ev yek dibe sedema afirandina derfetên kar ên nû û zêdekirina çalakiyên aborî. Aborînas tekez dikin ku bihêzkirina aborîya jinan, dibe alîkar ku rêjeyên hejariyê kêm bike û pêşketineke domdar bi dest bixe.

### Berdewamiya zehmetiyan

Tevî vê pêşketinê, jin hîn jî bi çend astengiyan re rûbirû dimînin ku beşdariya wan a tevahî di aboriyê de sînordar dikin. Di nav van zehmetiyan de yên herî berbiçav cudahiya mûçeyan a zayendî, derfetên kar ên sînordar ji bo jinan di hin civakan de û adet û kevneşopiyên ku carinan beşdariya jinan di hin pîşeyan de sînordar dikin, hene. Gelek jin di gihîştina çavkaniyên aborî yên wekî deyn û derfetên istismarê de jî zehmetiyê dikişînin ku ev yek bandorê li ser şiyana wan a pêşxistina karsaziyên xwe dike.

### Li gorî hin lêkolînên navneteweyî

Tevî ku di cîhanê de bi nêrandin û nirxandineke giştî em bala xwe bidinê, her kes dibêje ku hebûna jinan di aboriyê de, xwesertiya wê di aboriyê de, bandora rêxistinkirina jinan li ser aboriya giştî û başkirina rewşa aboriya gel û avakirina derfetên kar, heye. Lêbelê; ev yek raste, lê çiqas di piratîkê de hatiye kirin, ev yek pir girîng e. Li gorî lêkolînkirina me ji mijara cihgirtina jin di faktorên aboriyê de li cîhanê, hin lêkolînan ev yek diyar kirin. Jin nîvê nifûsa cîhanê pêk tînin. Lê dîsa jî ew bi awayekî berbiçav ji meqamên biryardanê dûr in. Jinên serokên dewletan kêm in. Jin di meclîsên şîrketan, di meqameyên rêveber û di rolên serokatiyê de hindikin. Kêmkirina cudatiya zayendî di kar de, dikare ji feydeya kes ji aboriya cîhanî, serê kesî di demek dirêj de li seranserê welatan bi navînî 20 ji sedî zêde bike. Bi kurtasî, doza wekheviya zayendî û hêzdarkirina jinan li cihê kar qet ewqas bihêz nebûye. Amar anku bîlançoyên li ser vê yekê tên matmayîkirin. Îro, ji sedî nêzîkî 75 hemû mêr beşdarî hêza kar dibin. Li Başûrê Asyayê, tenê yek ji çar jinan dixebite. Li herêma Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê, tenê yek ji pênc jinan dixebite. Ev cudatiya zayendî zirarê dide pêşketina aborî, ji ber ku ew karanîna bi bandor a çavkaniyan asteng dike û hêza kar sînordar dike. Mixabin, qanûnên cudakar, bicîhanîna qels û astengiyên civakî hîn jî rê li ber pêşketina jinan digirin û potansiyela aborî ya welatan ditepisînin.

Em bi hev re li vê rewşê bifikirin? Li herî kêm 65 welatan, jin ji karkirina qezenckar di sektorên veguhastin, pîşesazî, înşaet, av, enerjî û madenê de ku pir caran mûçeyên bilindtir pêşkêş dikin, qedexe ne. Dema ku jin destûr distînin ku karên mîna yên mêran bikin, ew pir caran bi cûdahiyek mezin a mûçeyan re rûbirû dimînin. Li 93 welatan, hîn jî ji hêla qanûnî ve tê qebûlkirin ku jin ji bo karên bi nirxek wekhev mûçeyek kêmtir werbigirin.

### Rojhilata Navîn

Me xwest weke raporên xwe yên demên derbasbûyî, em dîsa bi taybet balê bikşînin li ser Rojhilata Navîn û hebûna jinan di van welatan di nava aboriyê de, zehmetî û bendên li pêşiya wê çi ne? eşkere bikin. Tevî pêşketinên di 10 salên borî de, di warê pêkanîna reformên qanûnî û siyasî de, herêma Ereb hîn jî di warê bihêzkirina jinan a ji hêla aborî ve bi gelek pirsgirêkan re rûbirû ye. Çend welatên Erebî ji bo zêdekirina gihîştina jinan bo bazara kar, misogerkirina mûçeyên wekhev û têkoşîna li dijî cudakariyê li cihê kar guhertinên yasayî çêkirine.

Pêşketinên girîng di warê îmkankirina jinan di xebatên ku berê ji bo jinan qedexe bûn û teşwîqkirina beşdariya wan di karsaziyê de bi rêya bernameyên perwerdeyê, teşwîqên darayî û piştgiriya polîtîkayê de hatine bidestxistin. Ev destpêşxerî rola jinan a girîng di pêşketina aborî û geşepêdanê de destnîşan dikin.

### Li pêşiya pêşketina jin di aboriyê de li Rojhilata Navîn çi dibe asteng?

Tevî pêşketinên ku gelek welatên cîhanê di warê bihêzkirina jinan ji aliyê aborî ve bi dest xistine jî, jinên li Rojhilata Navîn hîn jî bi pirsgirêkên girîng re rûbirû dimînin ku beşdarbûna wan a çalak di aboriyê de sînordar dikin. Ev zehmetî di rêzek faktorên civakî, qanûnî û aborî de xwe nîşan didin ku bandorek rasterast li ser derfetên jinan ên ji bo kar û hilberînê dikin. Kevneşopî û adetên civakî di nav astengiyên herî girîng ên li pêşiya bihêzkirina jinan a aborî de ne. Di gelek civakan de, nêrîna kevneşopî ya li ser rola jinan hîn jî wan bi malbat û malê ve sînordar dike ku ev yek qebûlkirina jinan di warên cûrbecûr ên aborî de, nemaze di hin pîşeyên ku wekî qada tenê ya mêran têne hesibandin, sînordar dike.

Qanûn û rêziknameyên nebaş jî astengiyeke din a li pêşiya beşdariya jinan a di warê aborî de ne. Her çend hin welatan qanûnên ku piştgirî didin mafê xebatê yê jinan hene jî, bicîhanîna qels a van qanûnan an jî nebûna qanûnên ku mûçe û derfetên wekhev ji bo her du zayendan garantî dikin, jinan di bazara kar de ji cudakariyê bêtir bêparastin dike. Herwiha, jin li gelek welatên herêmê bi derfetên kar ên sînorkirî re rûbirû ne, kar pir caran di sektorên taybetî de kom dibin, di heman demê de beşdariya wan di sektorên sereke an jî yên pêşeng ên aboriyê de sînordar e. Gelek jin di heman demê de ji bo dabînkirina fînansmana pêwîst ji bo destpêkirina pilan anku xebatekî xwe yê taybet, gelek astengiyan dikşînin ku ev yek dibe sedema ne vekirina rê li pêşiya pêşengtiya jinan di xebatê aborî de.



Ya din berpirsiyariyên malbatî yên ku jin hildigirin nayên paşguhkirin. Ew pir caran barê xwedîkirina zarokan û birêvebirina malê hildigirin ser xwe, ev yek jî şiyana wan a veqetandina xwe ji bo kar an pêşketina kesayetî sînordar dike. Wekî din, nebûna bernameyên perwerdehiya pîşeyî hebûna jinan di bazara kar de qels dike. Berevajî vê, gelek lêkolîn nîşan didin ku zêdekirina beşdariya jinan di aboriyê de dikare bi girîngî beşdarî piştgiriya mezinbûna aborî û bidestxistina pêşkeftina domdar li herêmê bibe. Ji ber vê yekê, pispor bawer dikin ku derbaskirina van astengiyan hewceyê reformên rastîn ên qanûnî ye, digel guhertinek di têgihiştina civakî ya li ser rolên jinan de, û afirandina hawîrdorek aborî ya piştgir ku rê dide beşdariya wan a giştî di sektorên cûrbecûr de.

Hêjayî gotinê ye ku paşguhkirin jin ji xebat û qada aboriyê, yek ji tundûtujiya aborî ya li ser jinan tê hesibandin.

### Herî dawî di hunder vê rapora xwe de me xwest em nêrîna Zanista Jineolojî yê derbarê vê mijarê de lê zêde bikin û zengîn bikin. Ka gelo di pergala heyî de çawa jin nikare cihê xwe yê çalak di aboriyê de bigre?

Aborî bingeha civakên serkeftî ye û têkiliya di navbera jin û aboriyê de têkiliyek dîrokî ya bingehîn e, lê bi demê re ew di berjewendiya serdestiya mêran û pergala kapîtalîst de hatiye xirabkirin.

Lêkolînên dîrokî û arkeolojîk piştrast dikin ku jin di pêşdîrokê de, bi taybetî di serdema Neolîtîk de, hilberînerên sereke yên zanîna têkildarî aboriyê bûn. Zanîna wê ya kûr a li ser nebatan rê li ber pêşketina biyolojî û bijîşkiyê vekir, û çavdêriyên wê yên li ser demsalan û stêrkan hesabên matematîkî pêwîst kirin, bi vê yekê re bingeha aboriya çandinî û hilberîner ava kirin. Jin ne tenê beşdarên çalakiyên aborî bûn; ew aqil û plansazên sereke yên wê bûn.

Aborî amrazek e ji bo xizmetkirina “jiyana wekhev” li ser bingeha azadî û wekheviyê û ne armancek e wekî di ramana kapîtalîst de ku her tiştî zanist, xweza, jin di bin mentiqa qezenc û desthilatdariyê de dihêle. Esasê dîroka şaristaniyê bi dûrxistina sîstematîk a jinan û veqetandina wan ji hilberîna zanînê ve girêdayî ye. Têkiliya newekhev a di navbera zayendan de çavkaniya sereke ya hemû pirsgirêkên civakî ye wek koletî, serdestî û îstismar. Bi rêya vê yekê, civak tê bindestkirin û ew bi rêya bêçaretiya fêrbûyî dixebite, da ku civakê ji baweriya bi hêza xwe ya guhertinê bêpar bike.

Ji nû ve avakirina rola jinan bi eşkerekirina fikra koletiya wan wekî jin dest pê dike ku dibe sedema kolonîzasyona (Koletî) wan a aborî, siyasî û civakî, da ku nêrîna yekalî ya ku rola jinan û dîroka aborî merjînal (tune dihesibîne) dike were sererast kirin. Ji nû ve avakirina rola jinan bi eşkerekirina fikra koletiya wan wekî jin dest pê dike ku dibe sedema kolonîzasyona (Koletî) wan a aborî, siyasî û civakî, da ku nêrîna yekalî ya ku rola jinan û dîroka aborî merjînal (tune dihesibîne) dike were sererast kirin. Ji nû ve nirxandina mîtolojî, ol û zanistê ji perspektîfa jineke azad, aboriyê ji qanûnên wê yên hişk azad dike, wê nêzîkî xweza û edaletê dike û nirxek nû dide wê. Ji “xebata dayiktiyê” wekî modelek xebata bi hev re ya berhemdar û girîng dest pê bikin, da ku teoriyek nû ya nirxê pêş bixin ku ji têgihîştinên kapîtalîst derbas bibe. Îlhamgirtina ji modelên kevnar vegera ser ruhê serdema “Xwedawenda Dayikê” ye ku tê de aborî li şûna berhevkirina dewlemendiyê, ji bo xizmetkirina civakê hatibû amadekirin, çandeke aborî ya kolektîf ji nû ve vejand, da ku xweseriya civakê, hevkariya di navbera cîranan de û entegrasyonê li şûna pêşbaziya wêranker pêş bixe.

Pirsgirêk bi dûrxistina jinan dest pê kir û çareserî bi vegera jinan ne tenê ji bo beşdarbûnê, lê ji bo ji nû ve avakirina çalakiyên aborî bi hiş, dest û zihniyeta jinan”dest pê dike.

Avakirina projeyek zanînê ya yekgirtî ne ku bi entegrekirina jinan di aboriya heyî de ye. Lê belê projeyekê pêşkêş dike ku aborî xwe ji nû ve pênase bike, wê ji pênasekirina wê wekî armancek dûr bixe û wê veguherîne amûrek ji bo azadiyê, bi berçavgirtina ku rizgariya jinan mifteya bingehîn a vê veguherînê ye.

Nêrîna ku ji aliyê “Jineolojî” ve li vir tê pêşkêşkirin, bangeke ji bo şoreşek zanînê ya berfireh ku jinan wekî hilberînerên zanînê û wekî mîmarên dîroka aborî vedigerîne cihê wan ê heqkirî. Jin ne tenê aktoreke aborî ya marjînalîzekirî ne ku divê di modelên heyî de werin entegrekirin, lê ew mifteya rizgarbûna xwe ji yekane rêbaza teorîk û pratîkî ya avakirina aboriyeke dadperwer û mirovî ne ku xizmetê ji jiyanê re dike, ne ku wê kole dike ye.

Aborî tê wateya hunera birêvebirina malê û di eslê xwe de peyveke Yewnanî ye. Ji ber vê yekê, divê dîrok vegere rêça xwe ya xwezayî û aborî jî vegere civakê, da ku tişt vegerin rewşa xwe ya normal.

---

**Ji Ramanên Jin**



**Bêrîtan Xalid**

## NEWROZ, ROJA JINÛVE VEJÎN Û AZADIYÊ YE

Em her yek di nav pêvajoya tekoşîna azadiyê ya salan de bûn neferên civaka gelekî Newroz bûyî ye. Ez bi vê zanebûna ku hestên min wekî germahî û coşa Newrozê geş dike, Newrozê li her kesî pîroz dikim. Cejna Newrozê ji bo gelê Kurd cejnek watedar û hêja ye. Tenê pîrozkirina sersala nû nîne, ew sembola azadî, serkeftin û mîrateya têkoşînê ya gelê Kurd e jî. Her sal di 21’ê Adarê de Kurd têkoşîna xwe ya li dijî niheqiyê bi îlhama efsaneya Kawayê Hesinkar ê ku agirê şoreşê li dijî Dehaqê zalim daye destpêkirin, bi bîr tînin. Ji wê demê ve Newroz bûye cejna rizgarkirin û xwe nûkirinê.Newroz ji bo gelê Kurd bi taybetî ji bo jinan ne tenê cejn e, ew peyama têkoşîn û nûbûnê ye jî. Ew di vê cejnê de soza xwe ya ji bo mafê jiyana azad û bi rûmet nû dikin.Newroz ji bo jinên Kurd ne tenê cejn e, ew roja nûkirina soza berxwedanê ye û bîranîna şervanên jin ên di parastina ax û rûmetê de canê xwe feda kirin e. Jinên Kurd bi zordestiya ducarî, netewî û mêran re rû bi rû man, lê îradeya wê ew kir hêzeke gelek xurt. Jina Kurd ne tenê daxwaza mafên xwe kir. Wê bi têkoşîn û sekna xwe mafên xwe bidest xist. Bû mînaka jina azad a ku dîrokê diafirîne û li benda naskirina tu kesî namîne.Dema ku di jiyana mirov de her çi dibe bila bibe bigihîje wateya xwe ya rastîn ew dem fêmkirin cihê xwe digre û xwe ji wateyê re berdide. Me wekî jinên Kurd û gelê Kurd wateya Newrozê fêm kir. Em ji ber wê bûne neferên gelê Newrozê, kelecana wê her sal carekî din û ji nû ve jiyan kirin ma dikare bi çend hevok û gotinan were ser ziman, bê guman na. Newroza ku ew çend xwe di dilê me de mezin kiriye çawa dibe em, li ser mezinbûna wê, geşkirin û coşa wê fedekariyê nekin û berdêlan nedin. Cejna Newrozê hem cejnekî geşkirina cîhana ferdan bi ser xistiye hem jî geşkirina kolektîf a cîhana gelekî bi ser xistiye. Ji ber wê Newroz ew çend li Biharê hatiye û Bihar lê hatiye. Newroz ne tenê dilê mirovan xweş dike, cîhana hemû zindiyên di Bihareke nû de ji nû ve vejîn dibin jî geş dike. Ji lewra em dikarin bêjin ku Newroz hîna jî ew pira di navbera mirov û xwezayê de nehatiye hilweşandin e. Ji ber wê yekê nepeniya Newrozê di navê wê de veşartiye. Tevî ku li gelek dewletan Cejna Newrozê fermî hatiye qebûlkirin jî, pirsgirêka Kurdî rastî kêşeyên siyasî tê. Herêmên Kurdan heya niha bi dagirkerî û koçberiyê re rûbirû dimîne. Di nava vê cengê de jina kurd têkoşîna xwe ji bo azadiya gelê xwe didomîne. Lê wê îspat kir ku azadiya rast bi rolên hevpar hewce ye û divê têkoşîna azadiyê berfirehtir bibe.Newroz ne tenê cejn e, ew peyama têkoşîn û nûbûnê ye jî. Gelê Kurd di vê cejnê de soza xwe ya ji bo mafê jiyana azad û birûmet nû dike. Newroz şewqa ku tarî nabe, agirê ku venamire û soza ku nayê şikandin e. Bi riya Newrozê jina Kurd mîrata berxwedan û têkoşîna dem dirêj ava dike û di wê baweriyê de ne ku azadî wê nêz be.Ez jî di vê nivîsê de dixwazim cejna Newroza îsal diyarî hemû rêhevalên me yê şehîd bikim. Bi navê wan, bi dilê wan, bi coş û hestên wan Newroza 2026’an cihê wê, di cîhana armanc û jiyana xwe ya tekoşînê de çêbikim .Newroza 2026’an jî carekî din vê rêyê nîşan me dide. Dîsa dibêjim zarokatiya me ya li dora agirê Newrozê digeriya îro jî lê digere.Ji ber Newroz, ji nû ve vejîn û cejna azadiyê ye.

---



# Hişyarî; Wê berdewama şer 45 milyon kesî birçî bike

Bernameya Xwarinê ya Cîhanê (WFP) ya ser bi Neteweyên Yekbûyî ve hişyarî dabû ku şerê li Rojhilata Navîn dikare di birçîbûna gerdûnî de rekoreke nû bîne û bêewlehiya xwarinê bigihîje asteke bilind.

**Navenda Nûçeyan**

Heke şerê li Rojhilata Navîn bidome, dibe ku bêewlehiya xwarinê ya gerdûnî bigihîje asteke rekorî ya nû. Ev jî bi xwe re jiyana bi milyonan dixe metirsiyekê de.

### Berdewamiya şer wê nêzî 45 mîlyon kesan rûbirûyê bêewlehiya xwarinê bike

Cîgirê Rêveberê Giştî yê WFP’ê Carl Skau, li Cenevreyê di daxuyaniya xwe de diyar kiribû ku heke pevçûn heta meha Hezîranê berdewam bikin, dibe ku nêzî 45 mîlyon kesên din bi bêewlehiya xwarinê ya mezin re rû bi rû bimînin.

### Birîbûn metirsiyeke mezin e

Hate ragihandin ku ev zêdebûn dikare astên birçîbûnê li cîhanê bibe lûtkeya dîrokî. Li gorî analîza saziyê, heke bihayê petrolê di ser 100 dolarî re bimîne û şer berdewam bike, dê bi mîlyonan kesên din li wan 320 mîlyon kesên ku



niha di bin bêewlehiya xwarinê ya mezin de ne, zêde bibin.

### 2022’an dîsa kirîza xwariyê derketibû û bandor li 349 mîlyon kesî kiribû

WFP’ê bi bîr xist ku rewşeke wiha di sala 2022’an de bi destpêkirina Şerê Rûsya-Ukraynayê re hatibû jiyîn û wê demê krîza gerdûnî ya xwarinê bandor li 349 mîlyon kesî kiribû. Li gorî saziyê, di mehên pêş de dibe ku tabloyeke wiha dîsa derkeve holê.

### Xetereyên herî girîng ên birçîbûnê li Rojhilata Navîn:

Bilindbûna pevçûnan: Şer û aloziyên leşkerî yên berdewam ajokera sereke ya zêdebûna bêewlehiya xwarinê ne, gihîştina alîkariyê asteng dikin û zirarê didin binesaziya çandiniyê. Ger şer heta nîvê sala 2026’an berdewam bikin, tê payîn ku 45 milyon kesên din jî bikevin nav lepên birçîbûna xirabtir.

Zêdebûna bihayê: Li gorî UN News, astengiyên veguhestina keştîyan li Deryaya Sor û rageşiyên li Tengava Hormuzê bûne sedema bilindbûna bihayên sotemenî û gubreyan, ev yek jî bûye sedema bilindbûna bihayên kelûpelan, bo nimûne li Somaliyê.

Girêdayîbûna bi hawirdekirinê: Li gorî UN News, gelek welatên herêmê bi giranî xwe dispêrin hawirdekirina genim û kelûpelên bingehîn (wek Sûdan ku ji sedî 80’ê genimê xwe hawirde dike), ev yek wan dike ku dema biha bilind dibin, krîzên xwarinê bixin xeterê.

Kêmasiya fînansmana (Temwîl) mirovî: Li gorî raporên, Bernameya Xwarinê ya Cîhanê bi kêmasiyeke fînansmanê re rû bi rû ye, ku ev yek şiyana wê ya bersivdayîna bilez ji bo bi mîlyonan kesên hewcedar kêm dike.

Ji ber van hemû sedeman bircîbûna karîsetbarên mezin bi xwe re tîne, ya bingehîn jî di warê tenduristiyê de. Nebûna ewlehiya xwarinê dibe sedema xetereyên cidî yên tenduristiyê, di nav de kêmbûna xwînê (anemiya kêmxwînî), îshala kronîk û kêmbûna enerjiyê ya akût ku bandorê li fonksiyonên girîng ên laş dike.

### Şer aştiyê nayîne, kirîz û bandorên mezin çêdike

Di vê çarçoveyê de her tim tê diyarkirin ku şer aştiyê bi xwe re naîne, lê kirîz û bandorên mezin çêdikin. Rojhilata Navîn û cîhanî jî, vê êşê her dem ji ber şer û pevçûnan dikşînin, yên dibin qurban jî mirovên bê sûc in. Ji ber her demkê li Rojhilata Navîn şer li cihekî derdikeve yan dîsa nû dibe. Ew jî dibe sedema kuştina bi hezaran ji mirovan, koçberî, wêranî û hwd… Di heman demê de li kêlek van windahiyan kirîzên aborî û jiyanî derdikev in. Di van salên dawiyê de ev yek bi awayekî berbiçav xwe dide pêş û her diçe rewş aloztir dibe.

---

# Li Nîjîriyayê tevgera DAIŞ’ê ya zêde, xeteriya li ser Rojhilata Navîn e

**Navenda Nûçeyan**

**Li Nîjeryayê tundiya cîhadîstan ji sala 2009’an vir ve berdewam dike. Heta niha zêdetirî 40 hezar kes hatin qetilkirin û bi qasî 2 mîlyon kes koçber bûne. Di sala 2026’an de bi dehan komên DAIŞ’ê hatine pêkanîn herî dawî di êrişeke xwekuj de 23 kes hatin kuştin û 108 kes jî birîndar bûn.**

Li Nîjeryayê ev demeke dirêj e êrişên çeteyên cîhadîst didomin û di encama van êrişan de gelek sivîl û welatî tên hedefgirtin û qetilkirin. Hat destnîşankirin ku hin komeke çeteyên cîhadîst bi ser gundan girtin û komkujî pêkanîn. Derbarê komkujiyê de çavkaniyên herêmî ji AFPê re êrişê de axivîne. Li gorî agahiyên çavkanî parve kirine li gundê Konkoso yê li herêmên Borguyê 38 kes, li Tungan Makerî 7 kes û li Pissayê kesek di encama êrişên çeteyên paşverû ve de hatine kuştin.



### Komkujî, şewitîndin û revandin didomin

Hat diyarkirin ku di êrîşan de gelek mal hatine şewitandin û hin kes jî hatine revandin. Li gorî raporên ewlekariyê, êrîşkar bi motosîkletan ketin gundan û komkujî pêkanîn. Polîsan êrîşa li Tungan Makerî piştrast kir û gotin ku lêpirsîna têkildarî bûyerên didomin. Hat diyarkirin ku çeteyên paşverû yên cîhadîst bi taybetî derdora Daristana Kainji ya navbera eyaletên Kwara û Nîjerê, ev demek dirêje li ser gundan digirin û komkujiyan pêktînin.

### Cîhadîst di meha Sibata 2025’an 160 kes kuştin

Di destpêka meha Sibatê ya 2025’an de li eyaleta Kwara zêdeyî 160 kes di êrişên cîhadîstan de hatibûn kuştin. Piştî êrişên dawî, lîderên ol û civakî yên herêmê bang li serokê dewletê Bola Tinubu kirin ku li herêmê baregeha leşkerî were avakirin. Li aliyê din, rêveberiya DYE’yê rewşa ewlehiyê ya Nîjeryayê ji nêz ve dişopîne. Tê diyarkirin ku hevkariya leşkerî ya navbera Washington û Abuja, di demên dawî de zêde bûye.

Li gorî çavkaniyên ewlehiyê, nêzîkî 70 êrişkarên bi motorsîkletan êrişî baregeheke leşkerî ya li gundê Cross Kauwa ku nêzîkî bajarokê Baga li herêma Gola Çadê ye kirin. Di dema êrişa roja duşemê de pevçûnên dijwar qewimîn.

Rayedaran diyar kir ku çekdar ji kampên xwe yên li Girava Dabar Masara li Gola Çadê ketin tevgerê û ji rêyek dirêj gihîştin baregehê. Li gorî agahiyan, baregeh hat şewitandin, 8 leşkeran hatin qetilkirin, 11 wesayîtên leşkerî yên çekdarî hatine îmhakirin û cîhadîstan çekên giran bi xwe re birin.

### Li eyaleta Zamfara ya li Bakur Rojavayê Nîjeryayê, di êrişeke çekdarî ya li ser gundekî de herî kêm 38 kes hatin kuştin

Zamfara li gel çeteyên ku bi bûyerên revandin, talankirin û avêtina ser gundan têne naskirin, her wiha ji ber gefa cîhadistan di nava pirsgirêkeke cidî ya ewlekariyê de ye. Polîs û rayedarên xwecihî diyar kirin ku êriş li gundê Dutse Dan Ajiyayê pêkhat.

Rayedarên xwecihî ragihandin ku êrişkar bi motorsîkletê ketin nava gund, gule li derdorê reşandin û êrişî sivîlan kirin. Li gorî agahiyên destpêkê herî kêm 38 kes hatin kuştin, lê belê hin çavkanî dibêjin ku 5 kes hatine kuştin.

Berdevkê polîsan anî ziman ku li herêmê kontrol ji nû ve hatiye pêkanîn û dewriye dewam dikin.

### Êrişên li bakur zêde dibe

Êriş piştî êrişên li eyaleta Kebbî ya cîran rû da ku koma cîhadist Lakûrawa avêt ser 7 gundan û bi dehan kes kuştin. Tê gotin ku têkiliya Lakûrawa bi rêxistinên ser bi DAIŞ’ê ve heye.

Herî dawî di encama êrişa xwekuj a li bajarê Maiduguri ya li Bakur Rojhilatê Nîjeryayê de herî kêm 23 kes hatin kuştin û zêdetirî 108 kes jî birîndar bûn.

Hate ragihandin ku li bajarê Maiduguri yê paytexta eyaleta Bornoyê di 17’ê Adarê de teqînek çêbû û herî kêm 23 kesan hatin kuştin û 108 kes jî birîndar bûn. Berdevkê polîsan Nahum Kenneth Daso diyar kir ku li gorî agahiyên destpêkê êriş ji aliyê kesê xwekuj yên DAIŞ’ê ve hatiye kirin.

# Fêlbaziya Hakan Fidan bû bela serê wî!

**Volqan Elî**

Tê bîra her kesî. Ji ber ku di ser re ne sed sal û ne jî hezar sal derbas bûye. Hema bêje heft-heşt sal berê bûne. Dagirkeriya Tirk û Hakan Fîdanê ku bi bi eslê xwe Kurd e, hemû dîn û harbûna xwe dijatiya Rojava-Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dikirin. çi bû ev gotina wî ku di rojên herî giran ê şerê cîhanê yê sêyemîn de bûye belaya serê wî?

Digot “divê em Rojava nehelin, biçin ser û di milê din re derkevin”. Lê di wê serdemê de hêzên Kurd ji ber şerê li dijî DAIŞ’ê li ser destan dihatin girtin. Ti sedema vê şerfiroşiya xwe nedikarîn nîşan bidin. Vaye ew gotina bi nav û deng a seroksîxur Hakan beg wê dêmê ji devê wî derket; “em ê biçin ji aliyê din ê sînor çand saroxan biavêjin û bêjin, ji aliyê din êrîş tên li ser me”. ya rast jî ew bû ku aqilmedariya bingehîn a vî karî ji ber seroksixuriya xwe bi hemû dilgermiya xwe Hakan beg dikir.

Dema em ji şibakeya wî ve lê binêrin; ma çima dijminahiya Rojava nekira! Sibe-du sibe eger Kurdên Rojava bigihîştana mafên xwe yên neteweyî, bi zimanê xwe perwerde bidîtana, çanda xwe bidana jiyîn wê derketa holê ku di bin destê dagirkeriya Tirk de jî Kurd dijîn û bêyî heq û hiqûqa xwe ya neteweyî… Ya hê jî girîngtir hin Kurdên wekî Hakan begê seroksîxur (dema ew axaftina xwe ya malûm dikir) wekî ‘kurmê darê’, ji hindur ve dara Kurdan dikojînin. Ev rastî wê baştir derketa holê!

Ev ne tenê îro, di destpêka dîrokê de jî wisa ye: destana Gilgameş-Enkîdo tê zanîn. Ji ber ku pir dirêj e, jixwe mirov nikare bi temamî behsa wê bike û ne jî hewce dike! Ancax eslê vê çi ye, em dikarin wê binin ziman:

Enkîdo, piştê ku dibe qiralê Sumer êrîş tîne ser welatê Kurdên wê demê. Gilgameş Enkîdoyê ku bi îhtimaleke mezin serokeşîrekî bi nav û deng e di şer de dîl digire û li ser vê yekê, Enkîdo ji xwe re dike bira. Di demeke kurt de Enkîdo fêrî Gilgameş û jiyana bajêr dibe, êdî naxwaze li welatê xwe vegere. Lê Gilgamiş, hişê wî li ser talana çiyayên Kurdan e. Ji ber ku herî baş Enkîdo wan deran nas dike û biqasî Gilgamiş şervantiya wî heye, Gilgameş wî (Enkîdo) qenea dike ku werin talana Hûriyan.

Me gotibû destan pir dirêj e em pê nikarin hemûyê pêşkeş bikin. werhasilî… Gilgamiş, Enkîdoyê min û te radike, tîne talana bav û bapîr û dapîrên wî bi xwe. Ha livir û ha li wir şerê birakujiyê Enkîdo pir serkeftî dimeşîne. Dawî de rêberekî bi navê Hûmbaba yê êlên Kurdan dîl digirin. Gilgamiş naxwaze Hûmbaba bikuje, dixwaze di kar û barê dagirkeriya welatê Hûriyan de bi kar bîne. Di vê kêliyê de ‘kurmê darê’, Enkîdo dikeve dewreyê. Ji Gilgamiş re dibêje “em bi lez û bez vî Hûmbabayê bikujin, ewqas zerar gihand me û leşkerên me kuştin”. Werhasil dawiya dawî Hûmbaba dikujin. Vaye cewherê destanê jî ev e. Yanî Enkîdo dizane ku Hûmbaba nekujin, Hûmbaba bi rengekî xwe rizgar bike, her kes wê bizane ku Enkîdo kî ye, çi kar kiriye û eslê wî ji ku ye!

Vaye meseleya Hakan Fidan jî wekî Enkîdo ye. Ji ber wê yekê diviyabû Rojava nemana! Çima? Rojava berdevkiya serdemê ya Kurdiniyê dikir. Eger bi ser bikeve ji bo teîfeya hemû ‘kurmên darê’ ne baş e (?) ji ber ku rastiya wan derdikeve holê. Çi mixabin e ku li çar parçeyên Kurdistanê û welatên dagirker hêzên ku li hemberê Kurdan herî zêde şer meşandine, bi bêesliya xwe Kurd in. ji Hakan bigire heta bi İsmet İnonu (hevalê yekemîn ê M. Kemal) wisa tê.

Ya din jî ew gotina “ji aliyê din ê sînor, em ê çend saroxan biavêjin…” di vê serdemê de bûye bela serê Enkîdoyê hemdem Hakan beg. Ji ber ku wisa xuya dike, şerê Îsraîl-DYE û Îranê wê di demeke kurt de dilê Trump xweş neke. Hêzên hegemon dixwazin şer li qadeke berfireh belav bikin. Herî kêm îdîayên hin dewletan û Tirkiyeyê ew e ku ew naxwazin bikevin şer, lê ew têne sorkirin. Gotinên wan çiqas rast in nayên zanîn. Ya em dizanin, fen û fîtên Hakan Fidan lê fitilîne! Çawa jî bibe wisa ye; yan bi rastî ew naxwazin bikevin şerê Îran yan jî ji bo ku bikevin şer wê gotina Hakan Fidan pêk tîne!

# Şahidê serdemekê

**Botan Amed**

Dema ku em li dîroka siyasî ya aloz a Rojhilata Navîn dinêrin, hin nav ne tenê ji ber çîrokên jiyana xwe, lê di heman demê de ji ber serdema ku ew temsîl dikirin jî têne bîranîn. Salih Muslum yek ji wan kesayetiyan bû ku mohra xwe li dîrokê de hiştiye. Şehadeta wî ne tenê dawiya jiyana siyasetmedarekî ye; ew di heman demê de îfadeyek sembolîk a vekişîna gav bi gav ji sehneyê ya nifşek e ku mohra xwe li nîvsedsala dawî ya têkoşîna siyasî ya Kurd hiştiye. Ji ber vê yekê, têgihîştina jiyan û şehadeta Salih Muslum di heman demê de tê wateya têgihîştina paşxaneya dîrokî ya xwestekên siyasî, berxwedan û hewldanên gelê Kurd ji bo veguherîna civakî li Rojhilata Navîn. Salih Muslum, ku li Kobanê gundê Şêran ji dayik bûye, her çend wî bi perwerdehiya teknîkî ya ku di ciwaniya xwe de wergirtiye endezyariyê şopandibe jî, hêdî hêdî ew ber bi rêyek cûda ve bir. Serdema dirêj a bê nasname hiştina gelê Kurd, bêparhiştina mafên siyasî, û jiyana di bin zexta domdar de di nav hevsengiyên siyasî yên tevlihev ên Rojhilata Navîn de yek ji faktorên bingehîn bû ku jiyana wî şekil da, wekî ku ji bo gelek rewşenbîr û siyasetmedaran jî kir. Bi demê re, ew bû kesayetek ku beşdarî têkoşîna siyasî bû ne ji pîşeya xwe ya teknîkî. Ev veguherîn ne tenê hilbijartinek takekesî bû, lê belê pêwîstiyek bû ku ji hêla şert û mercên wê demê ve hatibû destnîşankirin. Ji ber ku di wan salan de, tevgera siyasî ya Kurd ne tenê wekî rêxistinek siyasî, lê di heman demê de wekî têkoşîna nasname û hebûnê jî dihat dîtin. Jiyana siyasî ya Salih Muslüm bi taybetî di şekildana tevgera Kurd li Sûriyeyê de bandorker bû. Ew beşdarî avahiyên siyasî yên nû yên ku di destpêka salên 2000-an de derketin holê bû û bû yek ji aktorên ku ji bo xurtkirina temsîliyeta siyasî ya civaka Kurd li herêmê dixebitin. Ev rol bû sedem ku ew ne tenê wekî siyasetmedarek herêmî, lê di heman demê de wekî kesayetek siyasî ya ku di nav dînamîkên hêza herêmî de cih digire jî were dîtin. Têkiliyên dîplomatîk li paytextên cihêreng ên Rojhilata Navîn, peyamên ku ji raya giştî ya navneteweyî re hatine şandin, û nîqaşên li ser pirsgirêka Kurd profîla wî ya siyasî her ku diçe xuya dike. Şerê navxweyî yê ku li Sûriyeyê dest pê kir hem herêm û hem jî siyaseta Kurdî bi bingehîn guherand. Valahîyên siyasî û civakî yên nû yên ku bi qelsbûna desthilatdariya dewletê re derketin holê, rê li ber Kurdan vekir ku modelên rêveberiyê yên cûda li herêmên xwe pêşve bibin. Avahiya siyasî ya nû ya ku di vê pêvajoyê de li herêma Rojava derket holê, ji hêla hevsengiya hêzê li Rojhilata Navîn ve wekî pêşveçûnek berbiçav hate hesibandin. Di vê serdemê de, Salih Muslum ne tenê wekî serokê partiyekê, lê di heman demê de wekî nûnerekî ku di şirovekirina vê ceribandina siyasî ya nû de ji bo qada navneteweyî rolek lîst, derket pêş. Navê wî gelek caran di pêvajoya şirovekirina avahiya siyasî ya li Rojava ji cîhana derve re û avakirina têkiliyên dîplomatîk de dihate ziman. Lêbelê, têkoşîna siyasî bi çalakiyên siyasî ve sînordar nebû. Bedelên giran ên ku ji hêla kesan ve ji ber dîroka dirêj a pevçûnan li Rojhilata Navîn hatine dayîn, di jiyana wî de jî diyar bû, wekî ku di jiyana gelek kesayetên siyasî de jî diyar bû. Şehadeta kurê wî di dema pevçûnan de wekî mînakek berbiçav a ka ev têkoşîn çawa bi trajediyên kesane ve girêdayî ye, di bîranînê de hatiye nivîsandin. Windakirinên weha nîşan didin ku têkoşînên siyasî li Rojhilata Navîn ne tenê bi aliyên îdeolojîk an stratejîk ve sînordar in; ew di heman demê de bi êş û windakirinên kûr ên mirovî ve girêdayî ne . Ji ber vê yekê, şehadeta Salih Muslum ne tenê wekî dawiya biyografiyek takekesî, lê di heman demê de wekî girtina serdemek dîrokî jî dikare were şîrove kirin. Nûnerên nifşek ku ji salên 1970-an û pê ve li Rojhilata Navîn siyasî bûne, niha hêdî hêdî ji cihê bûyerê vedikişin. Ev nifş di qonaxên cuda yên tevgera siyasî ya Kurd de rolek lîst, beşdarî gelek veguherînên îdeolojîk û stratejîk bû, û ezmûnek bi siyaseta herêmî ve girêdayî hilgirt. Ew hêdî hêdî ji hêla nifşek nû ve têne guhertin, û têkoşîna siyasî bi şêwe û rêbazên cuda berdewam dike. Di bîra siyasî ya Kurd de, hin nav ne tenê ji bo rolên xwe lê di heman demê de ji bo serdema dîrokî ya ku ew temsîl dikirin jî têne bîranîn. Salih Müslüm dê wekî yek ji van navan were bîranîn. Jiyana wî mîna çîrokek e ku pêvajoya veguherîna siyaseta Kurd li Rojhilata Navîn nîşan dide. Jiyanek ku li gundekî dest pê kir hêdî hêdî veguherî rêwîtiyek siyasî ya dirêj ku bi siyaseta herêmî ve girêdayî bû; ev rêwîtî piştî derbasbûna ji şer, têkiliyên dîplomatîk û lêgerîna guhertina civakî bi dawî bû. Ji ber vê yekê, şehadeta Salih Müslüm ne tenê wekî windakirina siyasetmedarek lê di heman demê de wekî sembola serdemek ku di bîra tevgera siyasî ya Kurd de cihê xwe girtiye tê dîtin. Çîroka wî, mîna gelek kesayetiyên di dîroka siyasî ya tevlihev a Rojhilata Navîn de, beşek ji çîrokek e ku tê de têkoşîn û jiyana kesane bi hev ve girêdayî ne. Ev vegotin di heman demê de nîşaneya lêgerîn û hewldanên siyasî yên demdirêj ên ji bo guhertinê yên gelên herêmê ye.



# ‘Çarenûsa rojnamevanên li Reqa hatibûn girtin, ne diyar e’

**Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm diyar kir ku ji dema êrişên hikumeta demkî ya Sûriyê li ser bajarê Reqa yê, çarenûsa du rojnamevanan ne diyar e û ji bo çarenûsa wan bê diyarkirin ew bi gelek aliyan re dikevin nava pêwendiyê de.**

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Di 18’ê Çileya 2026’an de, dema hikumeta demkî ya Sûriyê dest bi êrişên li ser bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, bi sedan şervan û sivîl gihiştin asta şehadetê û hatin dîlgirtin. Herwiha gelek kes jî, ji dîroka êrişê de û heta niha çarenûsa wan ne diyare. Ji kesên ku windane rojnamevanên bi navê Êva Mariya Michelman û Ehmed Bolat ku dema li ser erka xwe bûn û rastî dişopandin, li bajarê Reqa ji destpêka êrişan pêwendî bi wan re hatiye qutkirin û çarenûsa wan ne diyar e.

**Ev rojnamevan kî ne û li kur kar dikirin?**

Li gorî agahiyên ber destê YRA, rojnamevana bi navê Êva Mariya Michelman (1989’an ji dayîk bûye), weke nûçegihana Ajansa ETHA û Ozgur TV li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar dikir. Di heman demê de rojnamevan Ehmed Polat ji sala 2016’an ve nûçegihanê ETHA û Ozgur TV bû, vê dawiyê jî edîtor û nivîskarê malpera Kurdistanazad a ku sala 2025’an hatibû damezirandin.



**‘Li Reqayê pêwendî bi rojnamevanan re hat qurtkirin’**

Li ser qutkirina pêwendiyê bi rojnamevan Êva Mariya û Ehmed Polat Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) li ser malpera xwe nûçeyek belav kir û tê de diyar kir ku agahiyên dawî nîşan didan ku dema ew her du rojnamevan di avahiyek dorpêçkirî de li Reqayê bûn, raport û nûçeyên di derbarê êrişan de amade dikirin, têkîliyan bi wan re qut bûye. Ji wê demê û vir de tu agahiyên piştrastkirî li ser çarenûsa wan nîne, ev yek jî dihêle metirsiya di derbarê jiyana wan de zêde dibe.

**‘Pêwîst e qanûnên navnetewî û parastina rojnamevanan were kirin’**

Herwiha YRA bang li hemû aliyên pêwendîdar kir ku çarenûsa her du rojnamevanan were eşkerekirin û berpirsiyariya xwe ya exlaqî û yasayî ji bo gerantiya jiyan wan, pêk bînin. Di heman demê de YRA tekez kir ku pêwîst e rêz ji qanûn û peymanên navneteweyî yên parastina rojnamevanan û kedkarên çapemeniyê re were girtin û bi lez li ser rewşa wan agahiyên piştrast, werin wergirtin.

Li ser vê mijarê Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm ji Rojnameya me re axivî.

**‘Divê rêxistin û saziyên berpirsyar erka xwe pêk bînin’**

Evîn Îbrahîm diyar kir ku ji dema ku pêwendiyên wan ji her du rojnamevana hatiye qut kirin û heta roja îro ew bi rêxistinên parastina mafê rojnamevanan re têkildar in û wiha axaftina xwe berdewam kir: “Ji bo ku erka xwe ya rojnamevan pêk bînin û rastiya li ser rûyê erdê ji cîhanê re eşkere bikin, rojnemevana bi navê Êva Mariya û Ehmed Bolat li bajarê Reqayê dixebitîn. Piştî derketina şer li bajêr di 18’ê Çileya 2026’an de, pêwendî li gel her du rojnamevanan qut bû, heta niha jî çarenûsa wan ne diyar e. Ev yek metirsiyê dixe dilê malbat û hevalên Êva Mariya û Ehmed Bolat de.”

**‘Em nizanin şehîd an dîlgirtî ne’**

Evîn Îbrahîm anî ziman ku ji bo zelelkirina rewşa rojnamevan Êva Mariya û Ehmed Boat ew dixebitin û wiha got: “Ji destpêka ku agahiyên her du rojnamevana hat qutkirin, em bi rêxistin û saziyên parastina mafê rojnamevanan re di nava pêwendiya de ne, bi taybetî ji ber ku rojnamevan Ehmed Bolat endamê Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) e. Lê mixabin heta niha tu agahî ne gihiştiye ber destê me, em nizanin ne şehîd bûn e ne jî dîlgirtîne.’’

Hevseroka Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Îbrahîm di dawiyê de bang li saziyên berpirsyar kir ku ji bo rojnamevan Êva Mariya û Ehmed Bolat erkê xwe pêk bînin û di zûtirîn dem de çarenûsa van her du rojnamevana diyar bikin.

# Gelê Serêkaniyê û Girê Spî li benda vegerek bi ewle ne

**Aryen Hesen**

**Gelê Serêkaniyê û Girê Spî ji ber êrişên dewleta Tirk û çetyên pê ve girêdayî ji 2019’an ji warê xwe koçber bûne, ew 7 sal in bi zehmetiya jiyana di kampan de rû bi rû ne. Lê hêvî û daxwaza wan vegerek bi ewle ye.**

Gelê Serêkaniyê û Girê Spî ku di 2019’an de ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên pê vê girêdayî bi dare zorê koçber bûn û berê xwe dan kantona Cizîrê û li wê derê di kampa bi navê Waşûkanî û Serêkaniyê ku li Hesekê dikeve bi cih bûne. Ev koçber bi zehmetiya werza zivistana a sar û havîna germ de rû bi rû dimînin. Di heman demê de li gorî hemû kêmaniyên jiyana ji bo vegera li ser warê xwe liberxwe didin.



**Serêkaniyê û Girê Spî**

Di 9’ê Cotmeha 2019’an de, dewleta Tirk şerê dagirkerî ku li Efrînê dabû destpêkirin berdewam kir û li dijî herêmên Girê Spî û Serê Kaniyê asta dagirkerîyê hîn zêdetir berfireh û dijwartir kir. Bi hinceta avakirina herêmeke ewlehiyê li Bakurê Sûriyê êrîşê dagirkeriyê rewa kir. Bi operasyona “Kaniya Aştiyê” di 9’ê cotmeha 2019 an de bajarê Serêkaniyê, Girê Spî gundewarên van bajaran hatin dagirkirin. Lîstoka bi navê qadên ewle avakirinê de hatî lîstin di 7’ê Tebaxa 2019’an de bi lihevkirina dewletên yekbûyî yên Emerîkayê û Tirkiyê de xistin meriyetê. Bi pêkanîna vê lihevkirinê re ji bo ku dewleta tirkiyê êrişên xwe hîn hêsantir bike pêkbîne hêzên Emerîka xwe ji hêrêmê vekişandin. Bivî awayî dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên li ser herêmê xistin meriyetê û bi fermî hêzên Emerîka, bajarên Girê spî û Serêkaniyê radestî dewleta Tirkiyê kirin.

**Çekên di asta navneteweyî de qedexekirî li Serêkaniyê hat bikaranîn**

Êrîşên Tirkiyê yên di dîroka 10-13’ê cotmehê li hemberî sivîlan çeka fosfor hat bikaranîn. Li gor lêkolîna rêveberên PEAS enstutiya Swîsrê bikaranina çekên fosfor hate tespît kirin. Dîsa pisporê Epîdemîlojî, Mîkrobiyolojî û îmmunolojiyê Dr. Ebas Mensuran li gorî lêkolînên kirî da diyar kirin ku di 30 kesên kû di nav wande sê zarok hebûn bandora çekên kîmyawî hatiye dîtin. Di rapora ku ji aliyê Dr. Ebas Mensuran ve hatî amade kirin de çend cureyên şewatê hatine dîtin û hate gotin ku dewleta Tirk li hemberî sivîlan çeka kîmyewî, gazên asfîksîk, jehrîn a ku di asta navneteweyî de qedexekirî li hember gelê Serêkaniyê û Girê Spî hatin bikaranîn.

**Koçberkirina bi darê zorê û kiryarên dijmirovî**

Di êrîşên dewleta Tirkiyê ya dagirker û çeteyên girêdayî wî ve bi dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî re zêdetirî 375 hezar sivîl hatine koçber kirin. Ji siyaseta demdirêj ya dewleta Tirk diyar dibe ku guhertina demografik bingeh digire. Leşkerên dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî bi dagikirina serêkaniyê re kiryarên dijmirovî bi serê sivîlan dikirin. Bi sedan sivîl hatin qetilkirin û revandin di heman demê de mal û milkên sivîlan hatin talankirin û standin. Kesên ji ber ku Kurdin hatine girtin heya niha hin ji wan winda ne. Herwiha bi sed hezaran ji gelê Serêkaniyê û Girê spî ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên pê ve girîdarî neçar man ku ji cih û warê xwe koçber bibin. Ev dagirkirin ne tenê guhertina demokrafî armnac dikir, lê belê nasnameya Kurdî winda bike û bibe herêmek Ereb bi serweriya û mudexeleya Tirkiyê. Ev koçberî ne tenê revandina ji ber êrişan bû, lê belê ji ber kiryarên dewleta Tirk û komên çeteyan ango DAIŞ’ê bû.

**Zehmetiya jiyanê**

Gelê Serêkaniyê û Girê Spî ku ji 2019’an de ji malê xwe koçber bûne di kampa bi navê Serêkaniyê û Waşûkanî ku li Hesekê dikevin bi cih bûne. Jiyana di kampan de gelek zehmete bi taybet di demslal zivistanê de ev kamp di nava baran û sermanyê de dimînin. Di heman demê Kantona Cizîrê bi germbûna zêde di tên naskirin, ev jî ji bo jiyana di kampan de zehmertiya herî ber bi çave û gelek mînakên zehmetî û êşê di hundirê çar dîwaran de hatine veşartin hene. Koçberiya bi darê zorê, derketina ji mal, li pey xwe hiştina milk, dagirkirina war û ax yê ku li gel her kesî nasname û hebûne, ne tenê bandorê li ser jiyanê dike, lê belê bandora wê ya derûnî û pîskilojîk jî heye. Ev koçber bi hemû zehmetan re jiyana xwe di nava van kampan de didomînin, tevî êş, xerabbûna kampan û kêmaniyên jiyana li benda vegera li ser warê xwe ne. Gelê Serêkaniyê û Girê Spî ji bo jiyanek bi rumet û Kurdîtî ji ware xwe koçber bûn û niha di nava van zehmetiyan de jiyan dikin. Lê li beramberî wê ji bo vegereke bi ewle liberxwe didin. Gelê Serêkaniyê û Girê Spî ji 2019’an ve li benda vegerê ne û hertim hêviya wan ew e.

**Lihevkirina 29’ê Çileya 2026’an**

Di 29’ê Çileyê de di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de lihevkirinek hate îmzekirin, yek ji bendê serke vegera koçberan bû. Ev 7 salan ev koçber li benda veregera li ser axa waşûkanî ne. Hemû koçber daxwaza vegereke bi ewle dikin, groprek ji koçberên Efînê di çarçoveya pêkanîna vê bendê de vegerin bajarê xwe. Lê heya niha bi temamî hemû koçberên ji Serêkaniyê, Girê Spî û Efrîn vebegetî ne li benda minzgîniya vegerê ne. Vegera Koçberan xaleke heses û girînge, pêwîste û li gorî lihevkirina ev koçber vegerin li mal û milkên xwe. Koçberên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî di nava welatê xwe û axa xwe ya Sûriyê de ji ber êriş û mudexeleya dewleta Tirk di xaka Sûriyê de koçber dibin.

# Divê cejin û mafên Kurdan ne bi biryar bi destûr garantî bibin'

Sekretêrê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanî – Sûriyê Ciwan Siko diyar kir ev cara yekem di dîroka Sûriyê de Cejna Newrozê piştî ewqase sal ku di bin navê "Roja Dayikan" hatibû veşartin de, bi fermî tê nas kirin, lê nabe cejin û mafên Kurdan bi rêya biryarên demkî sînordar bibin, divê ev maf di destûrê de bên bicihkirin ku mafên neteweyî, siyasî û civakî yê gelê me bên garantîkirin.

**Ronahî Sadûn**

Derbarê Cejna Newrozê, girîngiya wê ji bo gelê Kurd û cara yekem bi fermî li Sûriyê tê erêkirin, Sekretêrê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanî – Sûriyê Ciwan Ebdulkerîm Siko bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Newroz ji bo Kurdan tê çi wateyê û çi girîngiya xwe heye?**

Cejna Newroz ji bo Kurdan ji cejnekê an destpêka salek e nû wêdetir e; ew semboleke kûr a azadî, nasname û çanda Kurdî ye. Her sal di 21'ê Adarê de tê pîrozkirin ku bi hatina biharê û nûbûna xwezayê re hevdem e. Ji ber vê yekê cejn bi fikra ji nû ve zayîn û jiyana nû ve, girêdayî ye. Ji bo Kurdan, Newroz destpêka salek e nû ya tijî hêvî ye, derfetek ji bo kombûnên malbatî û derbaskirina demê di nav xwezayê de, lixwekirina cilên gelêrî yên Kurdî, herwiha beşdarbûna stranbêjî û govenda komê ya bi navê Debkeya Kurdî ye. Cejn di heman demê de xwedî wateyeke neteweyî ya girîng e, ji ber ku ew girêdana Kurdan bi dîrok, çand û nasnameya xwe di nav sedsalan de nîşan dide. Ji ber vê yekê, Newroz ne tenê wekî cejneke biharê tê dîtin, lê wekî sembola azadî, nûjenî û zindîtiya domdar a çanda Kurdî tê dîtin.

**Piştî hilweşandina rejîma Baas, hikumeta demkî destpêkê itîraf bi Cejna Newrozê nekir, lê bertek û berxwedana gel hişt ku cara yekemîn Newrozê ji aliyê hikmetê li Sûriyê bê naskirin, nirxandinên we li ser vê çi ne?**

Ji destpêka şoreşa li Sûriyê ve, em Kurd bi dil û can û bi bandor beşdarî wê bûne, ji ber ku em di nav gelê Sûriyê de bûn ku herî zêde rastî neheqî, dûrxistin, înkarkirin û bêpariyê dihatin. Me bawer dikir ku guhertin dê bibe sedema sîstemek nû, sîstemek ku yên din qebûl dike, sîstemek demokratîk a piralî ku azadî, dadmendî û wekheviyê ji bo hemû pêkhate û gelê Sûriyê, bêyî ku cûdahiya wan a etnîkî an olî çi be, pêk tîne. Lê piştî zêdetirî 14 salan ji qurbanî û têkoşînê, hem jî piştî hilweşîna rejîma ku me hêvî dikir ku ew ê winda bibe, em li ser pêşerojek nû geşbîn bûn. Lêbelê, tiştê ku em îro ji hikumeta demkî ya Sûriyê dibînin wekî paşguhkirin, dûrxistin û înkarkirina mafan, polîtîkayên rejîma berê tîne bîra mirov, mîna ku tiştek nehatiye guhertin. Tevî vê yekê, gelê me yê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, di pabendbûna xwe ya bi destkeftî û mafên xwe de bi israr dimîne û her hewldanek ji bo ferzkirina rastiyek ku van mafan kêm dike, red dike. Lewma vê biryardariyê zextek girîng li ser rayedaran çê kir û ew neçar kirin ku fermanek derxin ku Newroz wekî cejnek neteweyî nas bike. Dibe ku ev cara yekem di dîroka Sûriyê de be ev cejn bi fermî tê nas kirin, piştî ku ewqase sal berê di bin navê "Roja Dayikan" hatibû veşartin. Ev naskirin piştî gelek salan ji têkoşîn û dana qurbaniyan hat. Di sala 1986'an de, Kurdên li Şamê xwepêşandanek li dar xistin û xwestin ku Newroz wekî cejneke neteweyî ji bo gelê Kurd were naskirin, lê xwepêşandan hate tepeserkirin û di dema wê de, Silêman Adî şehîd bû. Ew bû sembola têkoşîna Kurdan ji bo azadî, rûmet û naskirina nasnameya wan.

**Gelo ji bilî roja 21'ê Adarê yan em bêjin Cejna Newrozê, divê ji bo mafê Kurdan çi jî li Sûriyê bê misokerkirin, di vê derbarê de daxwazên Kurdan çi ne?**

Em, gelê Kurd ê Kurdistanê li her çar parçeyan, bi dehan salan rastî kuştin, îşkence û girtinan, herwiha bi karanîna çekên kîmyewî û çekên din ên qedexekirî yên navneteweyî, di heman demê de rastî cûreyên herî hovane yên qirkirinê, hatine. Ji ber vê yekê, ji bo gelê me tiştekî xwezayî bû ku vê neheqiyê red bike û ji bo vejîna neteweyî û parastina mafên xwe yên rewa, hewl bide. Ji vir û pê ve,



tevgerên rizgariya Kurd li deverên cuda yên Kurdistanê dest pê kirin, her beşek li gorî şert û mercên xwe yên siyasî û civakî tevdigeriya, mafên xwe yên neteweyî û siyasî dixwest, çi bi têkoşîna siyasî be çi jî bi rêbazên din ên ku ji hêla şert û mercan ve hatine ferzkirin. Li ser me li Rojavayê Kurdistanê jî ji damezrandina yekem partiya Kurdî li Sûriyê di sala 1957'an de heta îro, têkoşîna me di serî de têkoşîneke siyasî ya aştiyane ji bo azadî, demokrasî û mafên mirovan, hem ji bo bidestxistina mafên dadmend ên neteweyî û welatparêzî ji bo gelê me ye.

Daxwazên me ew in: ku zimanê Kurdî û nasnameya Kurdî bê naskirin, mafên siyasî yên gelê me li Sûriyê bên misogerkirin. Mafên gelê me nikarin tenê bi naskirina hin boneyan, wek Newroz, bi rêya ferman an biryarên demkî ve sînordar bibin; berevajî vê, divê ev maf bi awayekî zelal û eşkere di destûrê de bên bicihkirin ku mafên neteweyî, siyasî û civakî yên gelê me bi tevahî garantî bike. Ferman û biryarên îdarî dikarin bi fermanek nû bi hêsanî werin guhertin an betalkirin. Lê destûr garantiya rastîn û mayînde ya mafên gel temsîl dike. Ji ber vê yekê, bicihkirina mafên gelê me di destûrê de garantiya bingehîn a li dijî betalkirin an paşguhkirina wan e, nemaze ji ber atmosfera bêbaweriyê ya ku di nav gelek salan de ji polîtîkayên dûrxistin û paşguhkirinê kom bûye. Em jî zarokên vî welatî ne, lê em bi salan li vir wekî xerîban jiyane; carinan wekî koçber, carinan jî wekî bêwelat. Ji ber vê yekê, bidestxistina edalet, wekhevî û naskirina tevahî ya mafên gelê me rêya avakirina dewletek bi rastî demokratîk e ku rêzê li hemû pêkhateyên wê digire. Hewiha em nikarin rola girîng a Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di parastina herêmên me û parastina mafên neteweyî yên gelê me de ji bîr bikin an jî nedîtî bibîn. Xwîn û qurbanîdana şehîdên me sedema herî mezin e ku em îro em bi pîvanek azadî û rûmetê dijîn. Ev qurbanî dê ji bo nifşên pêşerojê çavkaniya serbilindî û îlhamê bimînin, da ku têkoşîna ji bo azadî û edaletê bidomînin.

**Ji bo gelê Rojavayê Kurdistanê bi taybet piştî ezmûn û pêvajoyeke giran, rewş çawa bûye û cûdahiya Newrozên van salên dawiyê ji salên berê çi ne?**

Em Kurdên li Rojavayê Kurdistanê bi ezmûneke demdirêj bi rejîma Hafiz Esedê rehmetî û paşê kurê wî Beşar Esed re jiyane, em rastî bêparkirin, girtin, hemû cûreyan û înkarkirina nasnameya me ya neteweyî jî hatine. Di encamê de, bersiva gelê Kurd ew bû ku têkoşîna xwe bi hemû awayên wê yên siyasî, neteweyî û çandî bidomînin. Amadekariyên ji bo Newrozê di nav çalakiyên herî girîng de bûn ku me li ser dixebitî, ji ber ku wan beşek mezin ji hewildanên me yên ji bo vejandina vê cejna neteweyî dagirt. Destpêk pir dijwar bû, ji ber ku em bi tacîzên ewlehiyê û girtinên keyfî re rû bi rû man, heta wê astê ku Kurd bi cudaxwaziyê hatin tawanbarkirin, her çend partiyek Kurdî jî tunebû ku banga cudabûnê bike. Em di partiyê de û bi taybetî mamoste Ebdulkerîm Siko yê rehmetî, sekreterê me yê berê, roleke dirêj di van amadekariyan de lîstin. Hejmarek komên folklorî yên me hebûn ku ji Dêrikê heta Efrîn û Şamê dirêj dibûn, wek komên: Ahîm, Şanîdar, Narîn, Serxwebûn, Xebat, Jîn, û Azadî. Ev kom di salên 1980'an de, di demên dijwar de û bi hewildanên mezin û gelek qurbaniyan hatine damezrandin. Lê îro, piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi saya xwîn û qurbanîdana bi hezaran gelê me yê Kurd li Sûriyê, rewş guheriye. Amadekariyên ji bo pîrozbahiyên Newrozê niha bi awayekî azad, li navendên taybet û bi çavkaniyên çêtir têne lidarxistin. Ev veguherîn bi saya hewildan û qurbanîdana hêzên me, Hêzên Sûriya Demokratîk e. Herwiha cudahiya di navbera demên berê û yên niha de pir mezin e.





# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Ehmed Ekaş çavkaniyek ji awazan û mêrgek ji peyvên bedew e. Wî xîmava pênûsa xwe û dengê xwe terxan kir ji bo xizmeta ziman û doza xwe, ku bû dengekî hunerî tê de wêje bi têkoşînê re peyv bi awaz re û êş bi hêviyê re têkilhev dibe.

Helbestvan Ehmed Ekaş yek ji wan kesên ku berpirsyariya peyvê girtiye ser milê xwe û tîpên xwe kirine menberek bo nasnameyê û helbest kirine neynik bo hezkirin, welat û pêdariyê.

Wî xîmava pênûsa xwe û dengê xwe terxan kir ji bo xizmeta ziman û doza xwe, ku bû dengekî hunerî tê de wêje bi têkoşînê re, peyv bi awaz re û êş bi hêviyê re têkilhev dibe.

Ew ji herêma şaristanî û şûnwarên dîrokî ye, herêma ku navê wê di dîrokê de wek stêrkek li ezmanê mirovahiyê dibiriqe, ew navenda şaristaniyên herî kevnar û çandên cihêreng bû, kelehên wê pêmayên hezar salan himbêz dikinû ji axa wê bênxweşiya mîrateya Mîtanîyan û Hûriyan difûre û zinarên wê ruhê Medyayan û Subariyan hildigirin, çîrokên bav û kalan li ser têkoşîn û avakirina şaristanî û jiyanê vedibêjin.

Ew herêma Efrînê ye, dergûşa dîrok û olên asîmaniye û wargehê hunermend û dengbêjên Kurd e yên ku bi dengên xwe yên zelal asîmanê hunera Kurdî ronî kirine, wek Cemîl Horo, Ednan Dilbirîn, Elî Tico û Omer Cemlo - û yên din ku peyv û awaz kirine aleya nasname û mîrasa resen ê Kurdî.

Li feraşînên vê xaka pîroz, hunermend û awazdênerê Kurd Ehmed Ekaş mezin bûye, ew di sala 1967'an de li bajarê Helebê ji dayîk û bavek Kurd (Elî û Hûriya) ku eslên xwe ji gundên Bilîlko û Bekî yên navçeya Raco ya Efrînê ne, di nava malbateke Kurdperwer, welatparêz û hunerî de ku ji 5 xwişk û 5 bira pêktê, hatiye dinyayê.

Ew li ser nirxên Kurdperweriya resen, hezkirina axê û dilsoziya bi welat re mezin bûye, ji zarokatiya xwe yekem awaz ji nebeza çiyê û xewna xwe ya yekem ji germahiya gund wergirtiye, van kokan di giyanê wî de evîna nasname, ziman û strana Kurdî ya resen şîn kirin.

Wî zarokatiya xwe di kuçeyên Heleba kevin de derbas kir, ku bi bêhna dîrokê difûre û bi jiyan û muzîka gelêrî dilepite, lewra bawerî di dilê wî de kûr dibe ku stran êşeke xweş e ku nasnameya hemû gelan îfade dike.

Ji xwezaya Efrînê, ji basarîna qopên çiyayê Bilîlkûyê, wî awazên xwe yên yekem wergirt û ji nalîna êşa Kurdî wî wateyên xwe yên kûr girtiye, lewma ji wan helbestên ku wekî lavijên çiyayan û awazên gundan, vehûnandiye.

Di navbera qelebalixiya bajarê Helebê û bêdengiya Efrînê de, taybetiyên kesayetiya wî ya hunerî û wêjeyî ava bûn.

Bavê wî yek ji xwendekarên destpêkê ên çiyayê Kurmênc yên derçûye Kolîjeya Hiqûqê bû, ku di sala 1954'an de koçî bajarê Helebê bû, wekî rêveberê yek ji beşên veguhestinê û alîkarê rêveberê giştî yê veguhestinê li wir kar dike, ew di salên şêstî yên sedsala borî de piştgirê şoreşa Barzanî bû û di salên heştêyî de jî piştevanê bizava rizgarîxwaza Kurdistanê li Bakur bû, ji ber ku mala wî bibû cihê kombûna şoreşger û têkoşeran û navendeke geş bo gotûbêj û ramana neteweyî ya Kurdî.

Ehmed xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û navîn li dibistanên Helebê de xwend, piştî wê li zanîngeha Helebê beşa zimanê erebî li Kolîjeya hunerê dixwîne, lê xwendina xwe li wir neqedand, ji ber ku di sala sêyemîn de bi karê siyasî re mijûl dibe û tevlî Tevgera Rizgariya Kurdistanê dibe, piştî nêzîkî pîst salan, ji bo xwendina Kolîjeya Hiqûqê vedigere zanîngehê û di sala 2012'an de diqedîne.

Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stran û muzîka Kurdî di temenekî biçûk de dest pê kir, dema ku temenê wî deh salî bû, di bin bandora jîngeha hunerî ya derdora wî û hunermendên mezin ên Kurd ên wekî Şivan Perwer, Aram Tîgran, Tehsîn Taha û Feqhê Teyaran de.

Ji biçûkatiya xwe de bi girîngiya tîp û milodiyê dihesiya û bi nivîsandina helbest û awazan bi wan re têkilî danî.

Di çardeh saliya xwe de di sala 1983'an de helbestên wî di destpêkê de tenê bi zimanê erebî bûn û di şanzdeh saliya xwe de helbestên wî di kovarên Felestînî yên wek: "Azadî", "Pêşve" û "Armanc" de hatin weşandin, paşê di sala 1985'an de dest bi nivîsandina helbestan bi zimanê Kurdî kir û awaz ji peyvên xwe re çêkirin bi wê yekê li tecrûbeya xwe ya hunerî aliyekî nû yê afirînerî û têgihiştinê zêde dike.

Wî rêwîtiya xwe ya hunerî û wêjeyî di sala 1986'an de bi koma Agirî ya Helebê re dest pê kir, dema ku bi komek hevalên xwe re careke din kom ji nû ve damerizandin, ji wan: Şehîd Celal, Şehîd Mihemed Osman, Bavê Cengê Seîd Berhat, Îbrahîm Ekaş, Rûken Ekaş û hwd. Çalakiya wî ya wêjeyî û hunerî tenê bi nivîsandina helbestan re sînordar nema, lê wî ji bo koma Agirî nivîsand, saz lêxist û gelek stran ji helbestên xwe çêkirin ku endamên wê di albûmên xwe de gotin.

Ehmed bi koma Agirî re di sê albûman de beşdar bû, ji stranên wî yên herî navdar:

1- Ey lo Bira (ji yekem awazên wî û gotinên Bavê Cengê)

2- Herin Xortên Kurdistanê û Ey Dicle ya dilbixem (ji awaz û gotinên wî)

Her wiha beşdarî nivîsandin û çêkirina albûma erebî ya ku ji aliyê komê ve hat derxistin bû; ji stranên wî di albûmê de:

1- Em ne evîndarên wêrankirinê ne

2- Herin şoreşê ref bi ref

3- Apo, sembola erdhejan

Di sala 1987'an de jî, wî xelata Strana Herî Baş di konsera Enîya Demokratîk ya ku li Zanîngeha Helebê hat lidarxistin de, bi strana "Filastîn Filastîn" wergirt, ji bo îsbat bike ku huner jî dikare bibe helwestek siyasî.

Di sala 1989'an de, wî bi hevalên xwe Mihemed û Ferîd Sirûr re tecrûbeya şanoya stranbêjiyê cara yekem li Rojavayê Kurdistanê ji bo zarokan bi karanî, bi navê "Qaz û Rovî" ji gotin û awaz xwe, paşê, ew bi şanoyeke din bi navê "Gur û Pez" berdewam kir, ku ji awazên wî û ji gotinên Diljan Cûdî (Bavê Ceger) bû, ev kar hemû bûn perçeyek ji tecrûbeyeke yekgirtî ku helbest, muzîk û şano li hev dicivîne, ji bo xizmeta zarokan û hunera Kurdî.

Ehmed Ekaş ji malbateke hunerî ya Kurdî ya kevnar e, ku li seranserê herêma Efrînê bi afirînerî û jêhatiyên cûrbecûr ku pêşkêş kirine tê naskirin.

Ew ji malekî ye bi muzîkê bêhna xwe dikşîne û bi ritma huner û bedewiyê dijî; hemû xwişk û birayên wî hunermend û mûzîkjenên profesyonel in ku li dîmena hunerî ya Kurdî şopa xwe hiştine.

Ew birayê mezin ê muzîkjen Îbrahîm û Ferhad, hunermend Cengîz û Hesen Ekaş û her du hunermendên hêja Rûken û Şêrîn Ekaş e, lewra ev malbat tabloyeke bêhempa ya aheng û afirîneriya Kurdî ya resen pêk tîne.

Di destpêka salên nodî de, Ehmed Ekaş tevlî tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê bûû beşdarî rêxistinkirina çalakiyên wêjeyî û hunerî li bajarên Herêma Kurdistanê bûû di şahiyên neteweyî de û belavkirina hişmendiya neteweyî û çanda hunerî di nav ciwanan de roleke girîng lîst.

Di sala 2000'an de koma "Şehîd Sîban" li gel rêhevalên xwe li herêma Qendîlê damezrand, da ku bibe menbereke hunerî ya berxwedan û xwedîbûnê û çavkaniya dengê ku derbirîna hezkirina ji bo welat û mirovahiyê, bi riya wê rêwîtiya xwe ya di xizmeta huner û nasnameya Kurdî de berdewam dike.

Ehmed di sala 2002'an de vegeriya Rojava, piştî ku jêhatîya xwe ya muzîkî bi tecrûbeyên salên dirêj ên karê hunerî li derve û li çiyayan pêşxistibû û bi xwe re tecrûbeyeke dewlemend anî ku di navbera hestên neteweyî û afirîneriya hunerî de têkilheviyek xweş çêkiribû.

Di sala 2003'an de, wî bi xanim Radiya

Terbûş re zewicîû du keç ji wan re çêbûn bi navên (Perya û Derya) û li bajarê Helebê rûniştibûn, ku li wir hejmareke mezin ji stranên xwe nivîsand û awaz ji wan re çêkir, her weha, ji bo birayê xwe hunermend Hesen Ekaş du albûmên girîng derxist:

1-Albûma yekem: "Efrîna Min"

2-Albûma duyem "Tenê Tu"

Ji nav stranên wan yên herî navdar ev in:'

1-Efrîna Min.

2- Ey Bilbilê Serê Darê

3- Ji te Hezdikim.

Di sala 2012'an de bi destpêka kirîza Sûriyê re derbasî Başûrê Kurdistanê bû û ji sala 2013'an ve li kanala Rûdawê xebitî, berpirsiyariya beşa Bakurê Kurdistanê girt ser milê xwe û di nav pênc salên xebata medyayî ya bi giranî de nivîsand û gelek rapor û gotar amade kirin.

Di wê qonaxê de bi komek hevalên xwe re Koma "Serxwebûn" ava kir, gotinên strana "Şengal" nivîsiye û di çêkirina awaza wê de jî beşdar bûye, wî her weha piraniya stranên albûma yekem a komê, ya bi navê "Panabar", ku ji neh stranan pêk dihat, nivîsand û awaz ji wan re çêkir, her weha ew beşdarî nivîsandin û çêkirina hin stranên albûma duyemîn, ku ji yanzdeh stranan pêk dihat, bû.

Di dawiya sala 2017'an de ew li Almanyayê bi cih bû, lê xerîbiyê



biryardariya wî lawaz nekir, lê ronî û geştir kir, wî ji xwişka xwe ya hunermend Rûken Ekaş re gelek stran nivîsî û çêkir, ji wan:

1. Dema Tu Digirî
2. Binivîse Yarê.

Her wiha wî gelek stran nivîsandin û awaz ji wan re çêkirin ku ji aliyê hunermendên din ên Kurd ve hatin gotin mîna:

1. Tu bûyî Dengê Zerdeşt – (Gulê, Dijwar, Şiyar)
2. Efrîn Rabe - (Dilo Doxan)
3. Serxweş kirim – (Osman Can)
4. Mereq neke lê Şêrînê (Hesen Ekaş).

Di dema salên şerê Sûrîyê de, Ehmed Ekaş piraniya arşîva xwe ya hunerî û wêjeyî winda kir; mala wî li Helebê hat talan kirin û hemû tiştên wê hatin têkbirin, di nav wan de sê dîwanên helbestên Kurdî ,du bi erebî û her weha du romanên ku hîn ronahî nedîtibûn.

Tevî vê yekê, wî rêwîtiya xwe ya nivîsandin û afirîneriya xwe berdewam kir, gotarên xwe yên siyasî û çandî yên derbarê pirsgirêka Kurd û Kurdistanê de li ser platformên medyaya civakî weşandin, bi çend zimanê ku wan baş dizane xebitî:(Kurdî bi zaravayên wê yên Kurmancî û Soranî û Erebî- herwiha Tirkî).

Bi hewldana xwe ya takekesî, wî 56 xelekên belgeyî pêşkêş kirin ku tê de behsa diziya dewleta Tirk a li ser stranên gelêrî û kevneşopî yên Kurdî kir, bi rêya wan asta desteserkirina sîstematîk a mîrateya hunera Kurdî eşkere kirû xwest ku rastiyan bibelge bike û rêzê li rastiya Kurdî vegerîne, ku desthilatdaran her dem hewl daye ku wan veşêre û berovajî bike.

Bi vî awayî Ehmed Ekaş dengekî xewna Kurdewarî dimîne, ji bo jiyan û azadî bi rastî distirê, bi dilpakiya ku pîr nabe û bi evîneke ku ji bîr nabê û dilsozê peyama xwe dimîne.

# Roja Cîhanî ya Avê... kirîza avê li Hesekê didome

22'ê Adarê Roja Cîhanî ya Avê ye, ev roj ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve di Kanûna 1992'an de hatiye destnîşankirin.

**Lîloz Hisên**

Roja Cîhanî ya Avê yekem car di 22.03.1993'ê de hate pîrozkirin. Ev roj bi armanca balkişandina ser lênêrîna ava vexwarinê û bi armanca bangewazîkirina her kesî ji bo alîkariyê di rêvebirin û birêvebirina çavkaniyên ava vexwarinê de tê pîrozkirin.

Av ji bo jiyanê li ser Erdê pir girîng e, bi qasî ji sedî 71 rûyê erdê vedihewîne. Lêbelê, mîqdarên ku heye ji bo karanîna mirovan pir bi sînor in. Daxwaza li ser avê ji ber mezinbûna nifûs û pîşesaziyê, digel guherîna avhewayê her ku diçe zêde dibe.

**Kêmbûna Avê.. pirsgirêkek cîhanî ye**

Her çend av piraniya gerstêrka me vedihewîne jî, kêmtir ji sedî 1 ava giştî ya li ser Erdê ji bo karanîna rojane peyda dibe. Gelek welatên cîhanê ji kêmbûna avê êşê dikişînin, zêdetirî du milyar mirov li deverên ku ava vexwarinê ya ewle tune ye dijîn, ku rasterast bandorê li tenduristiya giştî û pêşketina aborî dike.

Sedemên kêmbûna avê

Zêdebûna daxwaza avê bi mezinbûna nifûsê, qirêjiya ji ber çalakiyên pîşesazî û çandiniyê, guhertinên avhewayî mîna hişkesalî û bilindbûna germahiyê û rêveberiya xirab a çavkaniyên avê.

**Bandora kêmbûna avê li ser jîngeh û civakan**

Kêmbûna avê ne tenê bandorê li mirovan û civakan dike, lê di heman demê de bandorê li jîngeh û ekosîsteman jî dike. Kêmbûna avê hilberîna çandiniyê kêm dike û dibe sedema çolbûnê herwiha dibe sedema windabûna biyolojîk a cihêreng û zindiyên girêdayî avê tehdît dike. Ji aliyekî din ve, kêmbûna avê dibe sedema zêdebûna aloziyên jeopolîtîk di navbera welatên ku çavkaniyên avê parve dikin, wek çem û golên sînor-derbas.

**Mijara sala 2026'an av û wekheviya zayendî ye**

Neteweyên Yekbûyî û civaka navneteweyî amadekariyan dikin ku di 22'ê Adarê de Roja Cîhanî ya Avê bi drûşma "Li ku derê av diherike, wekhevî mezin dibe" pîroz bikin. Ev roj tê da ku destnîşan bike ku ava ewle û paqijiya kanalîzasyonan ne tenê pêdiviyên bingehîn in, lê mafên bingehîn ên mirovan û faktorên sereke yên wekheviya zayendî û hêzdarkirina jin û keçan li çaraliyê cîhanê ne.

Krîza avê ya cîhanî bandorê li her kesî dike, lê ne bi heman astê li hemûyan. Dema ku mirov nikarîbe bighêjin ava vexwarinê ya ewle û xizmetên paqijiyê nêzî malên xwe, newekhevî berfireh dibe. Jin û keç herî zêde zirarê ji vê yekê dibînin. Ji ber ku ew in yên pir caran avê ji bo malê berhev dikin û birêve dibin. Di encamê de ew dem, tenduristî, ewlehiyê herwiha derfetên ji bo perwerde, kar û beşdariya civakê winda dikin.

Ji ber vê yekê, çareserkirina krîza avê pêdivî bi nêzîkatiyek li ser bingeha mafan heye ku beşdariya jinan di plansazkirin û birêvebirina çavkaniyên avê de misoger bike, ne tenê wekî bikarhêner lê di heman demê de wekî biryarder, endezyar, lêkolîner û rêberên civakê jî. Tevlîkirina mêr û ciwanan di piştgiriya gihîştina ava paqij û pêşvebirina guhertina civakî de ji bo pêşxistina wekheviyê jî pir girîng e.

Kampanyaya îsal ji aliyê UNICEF û UN Women ve, bi hevrêziya UN-Water û bi beşdariya zêdetirî 30 hevkarên navneteweyî ve tê birêvebirin. Armanca kampanya ew e ku ji bo bidestxistina Armanca Pêşkeftina Domdar a şeşemîn (Av û Paqijî ji bo Herkesî) û Armanca pêncemîn (Wekheviya Zayendî) çalakiyek kolektîf teşwîq bike.

Ji sala 1993'an û vir ve, Roja Cîhanî ya avê bûye platformek salane ji bo ronîkirina pirsgirêkên têkildarî avê û bi nêzîkbûna pîrozbahiya 2026'an, banga ji bo çalakiyên hevbeş ji bo cîhanek ku her kes tê de ewlehiya avê û wekheviya zayendî kêfxweş dibe, ji nû ve tê kirin.



**Di Roja Cîhanî ya Avê de Krîza Avê li Hesekê**

Ji dema êrişa 2019'an ya Tirkiyê li Serê Kaniyê, ava vexwarinê ser zêdeitrî 1 mîlyon mirovî li bajarê Hesekê hatiye qutkirin. Mafê sivîlan ji ava têrker û ewle bêpar hatiye hiştin û ji aliyê hikûmeta Tirkiyê û aliyên din ên şer ve wekî çekek şer tê bi kar anîn, ku krîza mirovî ya heyî girantir dike û encamên wê yên karesatbar li ser civakên herêmî, ekosîstem, biyolojîkî û nasnameya çandî li herêmê hene.

Binpêkirinên Tirkiyê û kêmkirina bi zanebûn a para ava Çemê Firatê ya Sûriye û Iraqê ne tiştekî nû ye. Berevajî vê, ew pratîk in ku Tirkiyê bi dehan salan e, nemaze di salên hişkesaliyê de pêk tîne, lê piştî dagirkirina Tirkiyê ji hin parçeyên xaka Sûriyê ji sala 2016'an û vir ve ew rewş xerabtir bûye.

Her çiqas qeraxên Çemê Firatê di dîrokê de çavkaniya çandiniyê bûn û li ser rêça xwe kemberek kesk çêkirine jî, girtina ava Firatê li pişt bendavên Tirkiyê dibe sedema kêmbûnek xeternak a asta avê û qelsbûna çandiniyê yên xwe dispêrin Çemê Firatê. Ji dema dagirkirina bajarê Serê Kaniyê ji aliyê Tirkiyê ve di Cotmeha 2019'an de, di encama operasyona leşkerî de ku Enqereyê jê re digot "Operasyona Kaniya Aştiyê", civakên li bakur û rojhilatê Sûriyê bi zanebûn û cudakarî mafê wan ê ava têr û ewle ji aliyê hikûmeta Tirkiyê û komên girêdayî wê yên ku ji hêla wê ve têne piştgirî kirin, hatine bêparkirin, ji ber rêze qutbûnên dubare di pompekirina ava vexwarinê ji stasyona avê ya "Elok" li gundewarê Serêkaniyê. Stasyona avê ya Elokê, ku xizmetên wê gelek caran hatine qutkirin, ji bo gelên li herêmê, bi taybetî ji bo şêniyên bajarê Hesekê û bajarokê Til Temir û gundewarên derdorê, yekane çavkaniya ava vexwarinê ye û ji bilî vê, ew çavkaniya sereke ya veguhestina avê bi kamyonan e.

**Pirsgirêka avê ya Hesekê didomê**

Li bajarê Hesekê û gundewarên wê hîna krîza avê nehatiye çareserkirin. Stasyona Elok bi salan e sekinandine yan jî bi qismî dixebite. Di vê rewşê de zêdetirî milyonek kes li Hesekê û gundewarên wê bê av dimînin.

Pirsgirêka avê ya Hesekê çavkaniya xwe ji êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li ser bajarê Serekaniyê digirê. 9`ê Kanûnê sala 2019`an dewleta Tirk û çeteyên wê stasyona Elok bombebaran kir. Dema bajarê Serekaniyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hat dagirkirin, av bi temamî li ser Hesekê û gundewarên wê qut bû.

Şêniyên Hesekê û gundewarên wê bi rêya xwediyên tankên avê bi bihabûneke bilind pêdiviya xwe ya avê pêk tînin. Herwiha hewl dan ku bîran bikolin û pirsgirêkên avê çareser bikin. Ava bîran bi giştî şor e û gelek kils tê de heye.

Li gorî agahiyên nû ku gihane ber destê ajansa ANHA'yê saziyên avê yên li Serêkaniyê heyanî vê kêliyê ji bo xebitandina stasyona Elok tu gav neavêtine.

Li gorî berpirsên Şaredariya Hesekê, dewleta Tirk û çeteyên wê digot Rêveberiya Xweser elektrîkê bernade heyanî ku ew bikarin stasyona Elok bixebitînin. Lê niha hemû bendav di destê hikumeta demkî ya Sûriyê de ne û êdî nikarin hinceteke wisa deynin. Parêzgarê Hesekê Nûredîn Ehemd, nûnerên UNICEF`ê û hikumeta demkî ya Sûriyê têkildarî pirsgirêka avê ya Hesekê çend caran civiyan. Parêzgar Nûredîn Ehmed di çarçoveya lihevkirina 29`ê Çileyê balê dikişîne ser girîngiya xebitandina stasyona Elokê. Der barê pirsgirêka avê ya Hesekê de hîna tu gav nehatine avêtin.





# 'Divê hikumeta demkî bazarê li ser Kurd û şervanan neke'

Diyar Mihemed diyar kir ku wan komîteya malbatên dîlgirtiyan ava kir, da ku hemû malbat bi hev re di nava têkiliyê de bin û got, "Daxwaziya min wek birayek dîlgirtiyekî ku hikumet bezarê li ser Kurd û şervanê me neke. Em bi hêvî ne ji bo mijara dîlgirtiyan, pirsgirêk dernekeve û weke em bi wan re rast in, pêwîst e ew jî bi me re rast bin."

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Şervanên ku di şerê dawiyê de hatin girtin praniya wan hîn di destê hikumeta demkî de dîlgirtî ne, lê li gorî Peymana 29'ê Çileyê pêwîst bû ku ew hemû hatibana berdan û çarenûsa wan hatiba diyarkirin. Herwiha praniya şervanan jî ku ne li gel hikumetê ne, çarenûsa wan ne diyare, ji bo vê yekê malbatên dîlgirtiyan komîteyêk ji xwe re ava kirin bi navê "Komîteya Malbatên dîlgirtiyan" da ku bi hev re di nava têkiliyê de bin û agahiyên rast bi hev re parve bikin. Ji ber gelek caran kesên nenas bi wan re diaxivîn û li hemberî azadkirina zarokên wan daxwaza pereyan dikirin. Di vê çarçoveyê de hin ji nûnerên Komîteya Malbatên Dîlgirtiyan jî di 7'ê Adarê bi Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî re civiyan û tê de nîqaşên li ser rewşa girtiyan hate kirin. Tê de jî hejmara dîlgirtiyên li gel hikumetê yên leşker û ne leşker diyar bû.

Derbarê Komîteya malbatên dîlgirtiyan, herwiha hevdîtina komîteyê bi Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî re, endamê komîteyê ku birayê dîlgirtiyekî ye Diyar Hewas Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**'Giruba malbatên dîlgirtiyan bi armanca ku hemû malbat di nava têkiliyan de bin, hat avakirin'**

Diyar Mihemed di destpêka axaftina xwe de sedem û avakirina Komîteya malbatên dîlgirtiyan eşkere kir û wiha got: "Me çawa Komîteya Malbatên Dîlgirtiyan ava kir? Ew bû ku piştî dîlgirtiyên me çêbûn, di navbera heftiyekê de gelek pirsgirêk di nav malbatan de derketin holê. Hin kes bi malbatên dîlgirtiyan re diaxivîn û ji bo azadbûna zarokên wan daxwaza pereyan dikirin an jî dogtin me zarokên we kuştine, ev yek dibû sedama zêdebûna tevliheviyê. Ji ber vê rewşê, me biryar da ku Komîteyekê ava bikin, da ku hemû malbatên dîlgirtiyan bi hev re di nava têkiliyan de bin. Di vê çarçoveyê de, me girûpek WhatsAppê ava kir û hemû malbatên dîlgirtiyan ji hemû bajarên Rojava tevlî wê kirin. Armanca vê girûbê ew bû



ku agahiyên rast werin parvekirin. Wekî mînak, dema ku hevalên me li Hema hatin berdan, hin mijarên wan bi pereyan hatin çareserkirin an jî şertên din hebûn heta ku ew hatin berdan, ne diyare. Lê piştî serbestberdana wan, malbatên wan di girûbê de ragihandin ku zarokên wan bi wan re axivîne, em a ajokarê erebê daxwaza 3 milyonan kir ku wan bigihîne Qamişlo. Me ev agahî di girûbê de belav kir û heval agahdar kirin, hevalan jî xwe gihandin û ew anîn. Di hin rewşan de, kesên ku bi malbatan re diaxivîn daxwaza pereyan dikirin. Me her dem têkiliyên xwe bikar anîn û mijar ji bo hevalên berpirsyar şirove kirin, ew jî mijar çareser dikirin. Bi taybet dema hevalan dizanîn ku dîlgirtî li kîjan cihan an li cem kîjan eşîrên ereb in, pere didan û dîlgirtiyî dihatin berdan. Ji xwe komîteya me destpêka ji gundê Girbawî, yê girêdayî bajarê Qamişlo, dest pê kir ku ji aliyê du hevalên jin hate avakirin, yek ji wan xwişka min bû û ya din jî ji gundiya me bû, ez wekî kesê sêyemîn tevlî bûm. Piştre, çend malbatên din ji Qamişlo jî tevlî komîteyê bûn û bi vî awayî komîte hat avakirin. Armanca ew bû ku li ser mijarên dîlgirtiyan agahî bidin hev. Di heman demê de, komîte dixwest ku di demên ku çalakiyên wekî meş û xwepêşandan bên lidarxistin, bi rêxistinkirî be. Ji ber wê ew meşên biçûk çêbûn û pirsgirêk derketin, ne girêdayî komîteyê bûn. Em carekê derketin û bi awayekî rêxistinkirî ji bo diyarkirin û serbestkirina doza dîlgirtiyên me meş lidar xist."

**'Çareserkirina mijara dîlgirtiyan ji girîngtir bendên peymana 29'ê Çileyê ye'**

Diyar Mihemed derbarê hevdîtina wan a bi Fermandarê QSD'ê re wiha anî ser ziman: "Ji bo hevdîtina bi Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD), Mezlûm Ebdî, destpêkê me bi komîte û malbatên dîlgirtiyan re nîqaş kir. Wan diyar kir ku pêwîst e em bi hevalekî re rûnên. Li ser vê bingehê, me biryar da ku em wek komîte 8 an jî 9 heval bi fermandariyê re hevdîtinê pêk bînin. Berî hevdîtinê bi rojekê, me agahî da Ofîsa Têkiliyan, roja din em çûn û bi Fermandar Mezlûm Ebdî re hevdîtin pêk anîn. Di destpêka hevdîtinê de, mijara sereke ya me, rewşa dîlgirtiyan bû. Me jê pirsî ka kengî ew ê bên berdan û hejmara wan çiqas e. Fermandar Ebdî di bersivê de diyar kir ku hejmara dîlgirtiyan nêzîkî hezar û 70'ê kesan e ku hemû ne leşker in, lê di nava wan de ereb, sivîl û leşker, Herwiha hevalên kevin jî di nav wan de hene. Di heman demê de Fermandar Mezlûm got; ku ev cara yekemîn e ku hikumeta demkî bi awayekî vekirî û rast ev hejmar bi wan re parve dike û tekez kir ku divê hemû dîlgirtî bên berdan. Li gorî gotinên wî, li cem wan jî ên hikumetê hene û divê di çarçoveya guhertinê de, her du alî jî dîlgirtiyên hev bidin hev.

Herwiha Fermandar Ebdî got ku wan demek ji hikumetê demek diyar kirine ku bi 10 rojan sînordar e. Lê dema ku me rûniştin kir, 3 roj ji vê demê derbas bûbûn û demeke kêm mabû. Wî diyar kir ku divê di vê heftiyê de pêvajoya berdanê dest pê bike. Piştî vê axaftinê, di nav çend rojan de hin ji hevalên me yên dîlgirtî hatin berdan. Lê wî jî ragihand ku di navbera wan û hikumetê de hemû mijar, bi taybetî mijara entegrasyonê, hatine rawestandîn. Tenê çûna wan ya dawî bo Rimêlan û Sêmalka jî di çarçoveya hewildanên berdana hevalên ku di zindana Eqtan de mabûn ku piştre çûbûn Kobanê û hatin Cizîrê, bû. Ebdî di nava axaftina xwe de ev jî anî ser ziman ger di vê heftiyê de gavên pratîkî neyên avêtin û dîlgirtî neyên berdan, em ê li pişta wan bimînin û alîkariyê bikin, hem jî meşên mezin li her derê lidar bixin û zextê navneteweyî biafirînin, ji serokên welatên mezin re jî bibêjin wekî Fransa ku zextê li hikumetê bike, di mijara dîlgirtiyan de. Di dawiyê de, dubare kir ku ji bo me mijara



bingehîn dîlgirtî ye û divê her tişt li ser vê bingehê were çareser kirin."

**'Heya niha çarenûsa gelek kesan ne diyar ku dîlgirtîne yan şehîd in'**

Diyar Mihemed eşkere kir ku ne hemû dîlgirtî di destê hikumetê de ne, hin ji wan heya niha çarenûsa wan nehatiye diyarkirin û wiha bilêv kir: "Ji destpêkê ve, me diyar kir ku pêwîst e kî destpêkê derkeve, lê ne hat diyar kirin. Di heman demê de, mijareke din jî hate nîqaş kir, rewşa hevalên me yên ku ne di destê wan de ne û hîn jî li gel eşîran dimînin. Hin kes hene ku ji bo wan doza pera dikin. Hem jî hemû kes ne di destê hikumetê de ne. Ji ber vê yekê, gelek hevalên me li wir şehîd bûne û gelek jî hîn di dest de ne. Lê ew hezar û 70, praniya wan ên ku di şerê dawî de ji Dêrhafirê heta Hesekê hatine girtin. Herwiha, li ku derê bin jî, em di mijarên pere û hwd. de mudaxele dikin û hewl didin ku wan çareser bikin, lê mijara bingehîn dîlgirtî ye. Hejmareke jî ji wan winda bûne, hin jî dizanin dîlgirtî ne. Mînak, yek ji wan birayê min e, dema ku ket destê wan de, me dizanî ku ew bi 9 hevalên xwe re girtî bû. Lê hin hevalên din li Reqa û li ser rêyan man û dema ku di dema vedikişiyan, winda bûn. Ji ber vê yekê, em nizanin ka ew şehîd bûne, an jî hîn di dest de ne."

**'Hikumetê di mijara dîlgirtiyan de xwestin pirsgirêk û fitnê derbixînin'**

Diyar Mihemed destnîşan kir ku di pêvajoya berdana dîlgirtiyan li pey hev, hikumetê pirsgirêk derxistin û wiha domand: "Ji xwe, girûpa destpêkê ne di lihevkirinê de bû. Hikumetê wan berdan, lê ne diyar bû ka mijar çi ye. Giropa bingehîn ku di lihevkirinê de bû, ya ku di 10'ê Adarê de hatin berdan, lê piştre diviyabû ku ev pêvajoyê berdewam bike. Sekinandin jî ji ber vê yekê bû ku hikumeta demkî ne li gorî şertên lihevkirinê tev digeriyan. Hevalên me diyar dikirin ku gerek hejmar û navên kesên ku dê bên berdan, li gorî şertan diyarkirî bin. Lê, di rastiyê de, hikumetê kesên din ji derveyî wan lîsteyan dianîn. Hevalên me jî gotin ku her kes wê bê berdan, lê divê ev yek li gorî şertên lihevkirinê be, wek mînak, li Qamişlo, Hesekê û deverên din. Ev pirsgirêk hebû, lê bawerin hat çareserkirin. Ji xwe wan di destpêkê digot em ê Kurdan hemû bidin, lê Ereb bên hiştin, bi vê yekê dixwestin mijarekî fitnê çêbikin. Lê hevalan ev tişt qebûl nekir û bal kişandin ser ku divê hemû kes bêne berdan, bêyî cûdahî, çi sivîl, leşkerî û her kesê ku di dest de ye, divê bê berdan û ev yek divê bi awayekî rast û li gorî şertên lihevkirinê were pêkanîn."

**'Divê bazar li ser Kurd û şervanên me neyê kirin'**

Diyar Mihemed axaftina xwe wiha qedan: "Daxwaziya min wek birayekî dîlgirtiyekî ji bo hikumeta demkî ew e ku bezarê li ser şervanê me nekin. Em bi hêvîne ji bo mijara dîlgirtiyan, pirsgirêk dernekeve û weke em bi wan re rast in, pêwîst e ew jî bi me re rast bin. "

# DAIŞ berî 7 salan têkçû, lê destên reş ew vejîn kirin

Di 23'ê Adara 2019'an de DAIŞ weke rêxistineke leşkerî ya terorê li ser destê QSD'ê têkçû. Piştî 7 salan ji têkbirina wê, di dema heyî de dîse bi destên tarî û qirêj tê vejînkirin da ku bibe gefeke mezin li ser herêm û cîhanê.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



### Damezirandina DAIŞ'ê û rêwîtiya wê ya reş

Di 13'ê Nîsana sala 2013'an de Ebû Bekir Elbexdadî çeteyên DAIŞ'ê weke rêxistineke xwedî fikrekî herî xerab damezirand û têkiliyek dîrokî ya xurt di navbera van çeteyan û çeteyên Elqaida, Cebhet Elnusra de heye. Bi dirêjahiya salekê van çeteyan karîbû xwe rêxistin bikin, ji derdora 81 dewletên cîhanê xwedî nasnameyên cuda xwe komî ser hev bikin û serweriya xwe li ser Îraq û Sûriyê pêkbînin. Piştî DAIŞ'ê di 10'ê Pûşbera 2014'an de Mûsil dagir kir û bi şûn de di 15'ê Pûşbera 2014'an de jî Telafer dagir kir. DAIŞ'ê piştî dagirkirina van her du bajaran, vê carê jî berê xwe da Şengalê û di 3'yê Tebaxa 2014'an de gelê Êzidî di komkujiyê re derbas kir. Gelê Şengalê û bi sedan malbatên koçber ên Mûsil û Tilefer û navçeyên ku li Şengalê diman bê çare man, tenê çiyayê Şengalê wekî rêya xilasiya ji mirinê dîtin û di bin germahiya havînê de û bi meş li ser lingan xwe spartin çiya. Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ji bo xilaskirina êzidiyên li çiyayê Şengalê korîdoreke mirovî vekir. Bi sed hezaran kes ji komkujiyan rizgar kirin. Hêjayî gotinê ye ku di 13'ê Mijdara 2015'an de bi qehremanî û berxwedaneke mezin, bi pêşengiya Gerîlayên Azad, YBŞ, YPG û YPJ'ê Şengal ji çeteyên DAÎŞ'ê rizgar bû. Piştî wê gelê Şengalê xwe bi rêxistin kir û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk av kir.

### Têkbirina DAIŞ'ê ji Kobanê ber bi Baxozê ve…

DAIŞê di 15'ê Îlona sala 2014'an de ji sê aliyan ve dest bi êrişa ser Kobanê kir, armanc wan ew bû ku di nava çend rojan de Kobanê bi temamî bixe bin serweriya xwe. Di 16'ê Îlonê de li gundên Taalak, Cubb El Ferec, Dokerman û Boraz ên rojavayê Kobanê di navbera çeteyên DAIŞ'ê û şervanên YPG'ê de şerên dijwar qewimîn. Li aliyê rojhilat jî li gundê Serzûrî, Cern, Koberlek, Berkatak, Saronc û Qezelî şer û pevçûn çêbûn. Çeteyên DAIŞ'ê di êrîşê de tank û çekên herî giran bikar anîn û tevî hejmareke zêde ya çeteyan û bi piştgîriya nêzî 40 tankan, şervanên YPG û YPJ'ê dikarîbûn derbên giran li çeteyan bidin. Herwiha da ku çeteyên DAIŞ'ê bidin fêmkirin ku Kobanî ne mîna Mûsil, Şengal û Reqayê ye. Şer roj bi roj berfirehtir bû û hemû eniyên şer veguherîn kavilên şewitî. Piştî 134 rojan ji şerê di navbera şervanan û DAIŞ'ê de, efsaneya serkeftina Kobanê bi tîpên zêrîn tevî xwînê hat nivîsîn. Piştre jî hemleya rizgarkirina gundewarên Kobanê dest pê kir. Piştre jî Minbic û Reqa, heta Baxozê, DAIŞ'ê fêm kir ku têkçûna wan li Baxozê pêk hat ji şerê Kobanî dest pê kir. Di dawiya sala 2015'an de çeteyên DAIŞ'ê 100 hezar kîlomitir ji rûbera Îraq û Sûriyê kiribû bin serweriya xwe. Heriwha di pêşveçûna kiryarên xwe yên qirêj li ser gelên herêmê ve bi domdariya 2 salan, êdî qedera têkçûna DAIŞ'ê hat diyarkirin. Ji ber ku di destpêkê de Kobanê ji dest da û piştre jî Mûsil, Reqa Dêrazorê û têkçûna herî dawî li Baxozê bû. Şerê QSD'ê yê li dijî çeteyên DAIŞ'ê, ne kêmî şerê din yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. QSD'ê di çarçoveya pêngava ewlehiyê ya Şikandina DAIŞ'ê de, kampa Baxozê di 19'ê Adara 2019'an de ji destê çeteyan rizgar kir. Herwiha di 23'ê heman mehê de jî piştî 6 heftiyan hêzên QSD'ê karîn çeteyên herî xeternak li ser ewlehiya cîhanê têk bibin. Li gor malpera fermî ya ragihandina QSD'ê di encama vê pêngavê de ji destpêka sala 2019'an heta 23'ê Adara 2019'an 1879 çete hatin kuştin. Di heman demê de 29 hezar û 600 kes ji çete û malbatên wan xwe radestî QSD'ê kirin û hejmara kesên sivîl yên ku ji kuştinê hatin xelaskirin 37 hezar kes bûn. Weke tê zanîn ku şervanên QSD'ê li ser ruyê erdê xwedî roleke sereke bûn di şikandina çeteyan de û ev yek jî bi piştgirtiya hêzên Hevpeymana Navdewletî asîmanî pêk hat. Piştî 7 mehan ji têkçûyîna DAIŞ'ê, dawî li hebûna serkêş û damezrînerê DAIŞ'ê; Ebû Bekir Elbexdadî jî hat. Kuştina Bexdadî di 27'ê Cotmeha sala 2019'an li bakurê Sûriyê, Idlibê bi êrişeke asîmanî ji aliyê hêzên Amerîkî û QSD'ê pêkhat.

### Vejînkirina DAIŞ'ê li ser destê hikumeta demkî…

Geşedanên ku herî dawî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rûdan, derfetek da çeteyên DAIŞ'ê ku xwe zindî bikin. Ev derfet bi êrişên hikumeta demkî ya Sûriyê yên li dijî QSD û gelê Kurd pêkhatin. DAIŞ weke bombeyekê bû QSD'ê parastina wê dikir da ku hêzên wekî dagirkeriya Tirk pê nelîze û neteqîne, ji ber ku eger ev bombe teqiya wê Sûriyê, herêmê û tevahiya cîhanê li ber xwe bibe. Rewşa Sûriyê îro rû bi rûyê zincîrek pirsgirêkên siyasî û ewlehî ye ku digihe asta pirsgirêkên neteweyî yên mezin. Di van demên dawîn de, bi pêşketinên leşkerî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pirsgirêkek derket holê, encamên wê ne tenê bi erdnîgariyeke taybet re sînordar in, lê bandora wê li tevahiya axa Sûriyê ye. Piştî van geşedanan jî me dît ku çawa tevgera çeteyên DAIŞ'ê li seranserî Sûriyê çêbû. Piştî ku bi sedan çeteyên DAIŞ'ê ji navendên vegirtinê ango zindanên Hêzên Sûriya Demokratîk reviyane, derfet da DAIŞ'ê ku kaosa ewlehiyê biafirîne. Reva girtiyên DAIŞ'ê ji zindanan ne bûyereke derbasdar bû, lê di roja îro de wekî erdhejeke ewlekariyê tê pênasekirin.

### Çima çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nehatin dadgehkirin?

Mijara ku çima endamên DAIŞ'ê yên girtî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê nehatin dadgehkirin girêdayî siyaseta hêzên navnetewî û civaka navdewletî bû. Di serî de dewleta Tirk, nediket berjewendiyên dewleta Tirk a dagirker ku çeteyên DAIŞ'ê li herêma Rêveberiya Xweser bên dadgehkirin, ji ber ku wê serweriya vê rêxistinê û pişgiriya wê dikir û gelek welatiyên wê di nava DAIŞ'ê de bûn. Eger dosya dewleta Tirk û DAIŞ'ê di dadgehê de bi awayekî fermî bihatiba eşkerekirin wê rastî pirsgirêkeke mezin bihatiba. Mijara herî girîng ji bo lidarxistina dadgehê girêdayî danpêdan û qebûlkirina sîstema Rêveberiya Xweser bû, lihevhatineke giştî di navbera hêzên navnetewî, herêmî, hikumeta Şamê ya kevin û ya nû û Rêveberiya Xweser de tunebû. Ji ber mijara siyasî dadgehkirina DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêknehat, ev dadgeh bi çeteyên DAIŞ'ê re veguherî Îraqê, tekez ji bo nasnameyên endamên Tirk ên DAIŞ'î ji hêla hikumeta Îraqê ve werin veşartin, ev veşartin jî li ser daxwaza dewleta Tirk be.

### Cîhan deyndare QSD û gelê Kurd e… erka hêzên navnetewî çi ye

Piştî geşedanên ku li Rojavayê Kurdistanê û êrişên hikumeta demkî li ser QSD, Rêveberiya Xwser û gelê Kurd çêbûn, mijara şerê DAIŞ'ê û erkdariya QSD'ê ji hêla Hêzên Koalisyonê ve hate seknandin, piştgirî êdî nehate dayîn ji bo QSD'ê da ku operasyonên xwe li dijî revîn û vejîna DAIŞ'ê bidomîne. Weke tê zanîn ku gelê Kurd û hêza wê QSD'ê ked û berdêlên mezin dan di rêwîtiya şerê li dijî DAIŞ'ê de, piştî vê tevlîheviya ku hikumeta demkî ya Sûriyê afriand, hem jî peymana 29'ê Çileyê divê hêzên navdeweletî û civaka navnetewî bi erkdariya xwe ji bo QSD û gelê Kurd rabin. Di serî de divê rêxisinên mafê mirovan, saziyên navdewletî, civaka navnetewî û gelên cîhanê bibin hêzek ji bo mafên gelê Kurd û jinê wekî civakî, çandî û leşkerî di destûra nû ya Sûriyê de bi cih bînin, di heman demê de divê ji hikumeta demkî vê dozê bikin ku hikumet û dewletên weke Tirkiyê destwerdanê di herêmên Kurdî yên Rojava de neke da ku li gorî peymana 29'ê Çileyê gelê Kurd xwe ji hemû waran ve bi rê ve bibe.



## Cudahiya NEWROZA 2026'an

**Ahmet Aktaş**

Agirê şerê DYA/Îsraîl û Îranê jiyanê dikuje, agirê NEWROZA me kurdan a 2026an jiyanê zindî dike, xweş û geş dike.
Jixwa agirê desthilatan û zaliman, ne ji bo tariyê rohnî bikin û ne ji bo rê li pêşiya gelan vekin, berevajî, ji bo ku rohniya heye jî reş bikin, gel kor û lal bikin.
Şerê yekê û dudan ên cîhanê, li gel kuştina bi dehan milyon mirovan û bi sedan milyon birîndar û mexdûran tinê ranewestiyan, tovên dijminatiya dahatû ya dem dirêj di nava wan de çandin.
Lewma niha herkes, bi dermankirina wî tovê malxerab re mijûlin.
Divê mijarên sereke yên pêvajoya serdema vê sedsala 21ê baş were zanîn.
Du mijarên sereke hene: Yek; hêzên serdestên cihanê hewl didin ku dizaynek-sererastkirinek nuh a li gorî berjewendên xwe çêkin, dudu; gelên bindest ên mexdûr û mezlûm jî hewl didin xwe ji bin nîrê serdestiya van zaliman rizgar bikin û bibin xwedî jiyanek azad û aram û wekhev.
Aliyê yekê hegemonên cîhanê, dixwazin bi şerekî ji yên berê mezintir, ku jêre tê gotin şerê cihanê 3'min û jixwe despêkiriye, wan armancên xwe bi dest bixin. Jixwe, xema wan ne mirin û perişaniya mirovahiyê û xerabûna derdor û xwezayê ye.
Bêgûmaan aliyê duda mezlûmên cîhanê ye û berevajî, dixwazin bi rêya aştiyê, bê şêr û ceng, bi siyasetek demokratîk a xwediyê mafan û adil, armancên xwe bi dest bixin.
Wate, xema wan avakirin û misogerkirina jiyana azad û aştiya mayinde ya civakê û parastina xwezaya cîhanê ye.
Hilbet gelê me jî, di nava aliyê dudan de cih digre û NEWROZÊ jî, histûnek bingehîn a vê armanca mirovahiyê dibîne, ji bo xwe û gelên cîhanê.
Jixwe, gelê me, dîroka NEWROZÊ wisa nas dike û di tevgêra xwe ya hemdemî de jî bi heman naverokê dimeşe; lewma dibêje "Mazlûm, Kawayê hemdemî ye"!
Dîroka NEWROZA gelê me ya vê serdemê, bi tevgerî, di 1973 de bi Rêber Apo ve hatiye despêkirin û di 1982 de bi Mazlum Dogan ve hatiye dewam kirin, heta îro bê navber, bi zêdebûna hişmendî û rêxistinî di asta bilind de tê birêvebirin.
vêca cûdabûna îsal, ji salên berê çiye?
Berî her tiştî bi zanistiyek, her çend kêm be jî di astek hêja ya hişmendiyê de, ev roj tê destnîşan kirin û ev xebata bi tevgêrî tê despêkirin.
Heke ev zanist, hostayî û hişmendiya xurt nebuya, ev roja ku mirovahiya dîrokî ya cîhanê di xwe de dihewîne nikaribû zindî bibûya.
Jiber ku her çar dewletên dagirkerên qirker, hebuna vî gelî ji dîrokê rakiribûn, 'heft tebeqe' xistibûn bin erdê û wisa bawer dikirin ku êdî ev gel nikare raba ser xwe û ev gelê mirî nema dikare zindî bibe û hwd! Mirazên wan pêknehat.
Jixwe hêjatiya vê pêngava despêkê, ji hersalên berî xwe mezintir bûna wê û hîn gelek roj berî NEWROZÊ, taybetî bi 8ê ADARÊ re geşbûn û xurtbûna wê, cudahiya îsal a ji salên berê dide nîşandan ku, navê wê jî kirine NEWROZA AZADIYÊ!
Ruhê NEWROZÊ, gelê me û gelan pêkve dibe azadiyê. NEWROZ PÎROZ BE!



# Efrîn; Ji Berxwedana Serdemê heya vegerê (2)

Efrîna ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve di 18'ê Adara 2018'an de hat dagirkirin. Gelê Efrînê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî di 58 rojan de li hember dewleta Tirk û teknîka wê berxwedaneke bêhempa da meşandin.

**Stêrk Mihemed**



Di 18'ê Adara 2018'an de bajara Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve hate dagirkirin û gelê Efrînê bi dare zorê koçber bûn. Niha jî di sala 2026'an de wê dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve 8 salên xwe temam bike, di nava van 8 salan de gelê Efrînê bi zehmetiyan re rû bi rû man û sê caran ji ber êrişê dewleta Tirk, komên çeteyan û hikumeta demkî din bi dare zorê koçber bûm.

### Herêma Şehba

Piştî berxwedan 58 rojan a gelê Efrînê di 18'ê Adara 2018'an de bajarê Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve hate dagirkirin. Ji ber êrişên zêde û dorpêçek hovane ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên pê ve girêdayî gelê herêmê neçar man û bi darê zorê ji Efrînê derbikevin. Bi hezaran niştîcehên Kurd ji Efrînê bi darê zorê koçber bûn û berê xwe dan herêma Şehba û Til Rifet. Şehba herêmeke ku hatibû talankirin, xerabkirin û hin malên têde hatibûn hilweşandin. Gelê Efrînê dema derbasî Şehbayê bûn ji nû ve avakirin, tevî ku koçber bû, zehmetî û êş gelek bûn lê dîsa jî ji nû de destpêkirin û li hêviya vegerê bûn.
Li Şehbayê derfetên jiyanî kêmbûn, ji ber ku di navbera Şehba û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sînorên rêjîma Bass hebûn, derfet nedidan ku pêdiviyên jiyani derbas bibin. Lê li gorî wê jî gelê Efrînê dest ji pîvanên welatparêziyê bernedan û berxwedaniya xwe domandin. Careke din û ji nû ve sazî û dezgehên xwe yên girêdayî Rêveberiya Xweser avakirin û ji bo xizmet û pêwistiya gel xebat dan meşandin.

### Berxwedaniya Serdemê ya duyemîn

Gelê Efrînê 7 salan li Şehbayê derbaskirin, jiyana wan di navbera berxwedanî û bombebarankirina domdar ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî mabûn. Hêza gelê Efrînê ji êrişên dagirkeran mezintir bû. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker bi her awayî dixwastin îradeya wî gelî bişkînin û baweriya wan bi şervanan bê bandor bikin, lê her roj şervanên Efrînê ji gel re isbat dikir ku ew qehremanin û ji bo vî gelî têdikoşin. Carekek din gel û şervanên Efrînê diyar kirin ku berxwedanî û wekatparêzê pîvanê wan ya bingehîne.

### Careke din gelê Efrînê di pêlê koçberiyê re derbas bûn

Ji dema ku şer li gundewarê Rojavayê Helebê di sibeha 27'ê Mijdara 2024'an de, piştî êrîşeke hêzên "Heyat Tehrîr el-Şam" li ser hêzên "Artêşa Sûriyeyê" dest pê kir, Milîsên "Artêşa Neteweyî ya Sûriyê", di bin çavdêriya artêşa Tirk a dagirker de, li herêmên Ezaz, Mare û Babê dest bi seferberiyê kirin da ku operasyoneke leşkerî bi navê Berbanga Azadiyê li dijî herêma Şehba û hin gundên Şêrawa li gundewarê bakurê Helebê bidin destpêkirin ku bi deh hezaran koçberên Efrînê û gelê Şehbayê lê diman. Beriya vê yekê, vekişîna hemû yekîneyên artêşa Rûsî û Sûrî ji herêmê û hemû niştecihên bajarokên Nibûl û Zehra pêk hat. Êriş ji sê aliyan ve Rojava, Bakur û Rojhilat di sibeha roja Yekşemê, 1'ê Kanûna Pêşîn a 2024'an de dest pê kirin û heta nîvro ku hêzên Kurd ên herêmî ew paşve kişandin. Heya ku biryara vekişînê û derketina gel ji herêmê hate standin. Ji ber êrişên zêde ya komên çeteyan û ji bo parastina sivîlan di 1'ê kanûna 2024'an de biryara vekişînê û derketina gel ji herêma Şehbayê hate standin. Dîsa û careke din gelê Efrînê ji koçberiyê koçber bûn, tevî ku bi dare zorê gel ji Şehbayê derket ji ber ku gelê Efrînê digotin Şehba ji Efrînê ve nêze bêhna axa Efrînê tê me, em li hêviya vegerê ne em ji vir naçin. Lê mixabin û ji ber êrişên hov dîsa careke din koçber bûn û biryar hat giryin ku berê xwe bidin herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bibin.

### Koçberî Heleb û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn

Piştî ku di 1'ê Kanûna 2024'an ji bo ewlehiya gel û pêşî girtina komkujiyan, biryara derxistina gel ji herêma Şehbayê hate standin gelê Efrînê çareke din bi dare zorê koçber bûn, hin ji wan berê xwe dan Helebê li herdu taxên Kurdî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û yê dîtir jî berê xwe dan Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di rê de gel bi zehmetiyan re rû bi rû man herwiha li ser destê HTŞ' rastî kiryaran hatin. Piştî ku gel çend rojan di rê de man di 3'ê Kanûna 2024'an de beşek mezin ji gelê Efrînê gihaştin Tebqa, Reqa, Hesekê, Qamişlo, Dêrikê û li wê derê bi cih bûn. Dema ku gelê Efrînê gihaşt herêmên Rêveberiya Xweser yê ku di bin parastina QSD' de ne, piştî tirs û kiryaran bi ewlehiyake mezin hîskirin. Gelek koçberan cihê xwe di dibistan, kampên li Reqa û Tebqa de girtin û li gorî koçberiya duyemîn, eş û zehmetiyan jiyana xwe tevî hemû kêmaniyan di dibistana de berdewan kirin.

### Ewlehiya gel armanc digirin

Di 6'ê çile de çeteyên girêdayî hikumeta demkî û bi destekdayîna dewleta Tirk a dagirker êrişeke hovane bi ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê de çûn. Tevî ku di navbera meclîsa taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û hikumeta demkî a Sûriyê de lihevkirin hebû, lê gorî vê jî bi êrişeke berfireh bi ser herdu taxan de hatin û bi awayekî dijmirovî, bê ser û ber nava sivîlan bombebaran dikir. Di encama van êrişan de gelek Şehîd û birîndarî çêbûn, lê li kêlekî wê jî gel û şervanan berxwedaniyek mezin dan meşandin û bi qehremaniya xwe destanên nivîsandin. Herwiha her roj êriş û bombebarankirin li ser du taxên biçûk zêde dibûn, birîndar û Şehîd jî gelekbûn ji ber vê yekê û piştî berxwedaniya 6 rojan li du taxên biçûk li hember hikumeta demkî û dewleta Tirk bi lihevkirinekê di nevber Hêzên Sûriya Demokratîk(QSD) û hikumeta demkî çêbû ku şervan û sivîlan ji herdu taxan derbixînin dîsa jî û care sêyemîn gelê Efrînê piştî Efrîn û Şehba koçber dibin û berê xwe dan Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li wê derê bicih bûn.

### Ji Reqa û Tebqa jî koçber bûn

Piştî ku gelê Efrînê ji Şehba koçber bûn piraniya wan berê xwe dan Reqa û Tebqa li dibistan û kampande jiyanen xwe berdewam kirin, lê di 18'ê Çile de ji ber êrişên hikumeta demkî û rabûna hin êlên Ereb li dijî QSD'ê û Rêveberiya Xweser neçar man ku ji Reqa û Tebqa jî koçber bibin û berê xwe bidin Kantona Cizîrê. Bi hezaran ji gelê Efrînê tevî hemû zehmetiyan jiyana xwe di kamp û dibistanan de derbas dikir, lê dîsa jî cara sêyemîn ji ber êrişên hikumeta demkî koçber dûn. Bi hezaran ji gelê Efrînê ku li Reqa û Tebqa diman berê xwe dan herêma Cizîrê û niha li dibistan, mizgeft, akademî û saziyan de cihê xwe digirin. Ev koçber bi êşan re rû bi rû dinîn , lê tenê xwastekek wan heye ev jî vegerek bi ewle li ser axa xwe ye. Li gorî hemû bûyerên ku jiyankirine hêviya vegerê di dilê wan de lêdide û her roj li benda mizgîniya vegerê ne.

### Vegera koçberên Efrînê

Di 29'ê Çile de di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikûmeta demkî ya Sûriyê de peymanek hate îmzekirin yek ji bendên sereke yê vê peymanê vegera bi ewle ya koçberan ne. Di çarçoveya pêkanîna vê peymanê de di 9'ê Adara 2026'an de gropek ji koçberên Efrînê ku ji 400 malbet pêkdihat berê xwe dan bajarê Efrînê. Herwiha wê di demê pêş de gropên dîtir jî ber bi Efrînê ve rêkevin.

